

ZANISTNAMEya Felsefeyê



Çapa pdf. ya gotara

Felsefeya Aborînasiyê

Nivîskar: Daniel M. Hausman

Wergêr: Bilal Oztunc

Edîtor: Özlem Salmış

Hausman, Daniel M., “Felsefeya Aborînasiyê”. *Zanistnameya Felsefeyê* (Payîza 2025ê). Bilal Oztunc (Wergêr). Lînk = <<https://zanistname.com/nk/Entries/economics>>.

Navnîşana gotara orjînal li *Ansîklopedîya Felsefeya Stanfordê*:

Hausman, Daniel M., “Philosophy of Economics”, *The Stanford Encyclopedia of Philosophy* (Fall 2024 Edition), Edward N. Zalta & Uri Nodelman (eds.), URL = <<https://plato.stanford.edu/archives/fall2024/entries/economics/>>.

Perbendî: Arvand Salari

Hemû mafên vê berhemê parastî ne ji aliyê *Zanistnameya Felsefeyê* ve.

<https://zanistname.com/>

Felsefeya Aborînasiyê

Daniel M. Hausman

Wergêr: Bilal Oztunc

“Felsefeya Aborînasiyê” ji lêpîrsînên der barê (a) hîlbijartina aqlî, (b) nirxandina encam, sazî û pêvajoyên aborî û (c) hebûnnasiya diyardeya aborî û derfetên bidestxistina zanîna wan ve pêk tê. Her çend ev lêpîrsîn ji gelek aliyan ve di nava hev de bin jî, bi havil ye ku felsefeya aborînasiyê bi vî rengî wekî mijaran dabeş bikin, ku bikarin bi sebareti wekî şaxên teoriya çalakiyê, sincnasî (an felsefeya civakî û siyasî ya normatîv) û felsefeya zanistiyê bîn binavkirin. Teoriyên aborînasiyê yê li ser aqlîfî, kamiranî û hîlbijartina civakî tezên felsefî yê bi berbiçav diparêzin, ku bi gelemperî ji hêla lîteratûra felsefî ya têkildar ve tene agahdar kirin û li hember kesên ku bi teoriya çalakiyê, derûnnasiya felsefî, û felsefeya civakî û siyasî re mijûl dibin xwediyê eleqeyeke aşkere ye. Aborînasi, her çend heybera wê ji diyardeyên civakî pêk tê jî, hem ji ber taybetmendiyan wê yê bi kitekit û hem jî çiku xwediyê gelek taybetmendiyan berbiçav ên zanistên xwezayî ye, li hember kesên ku bi epîstemolojiyê û felsefeya zanistê ve mijûl dibin xwediyê eleqeyeke taybet e.

- 1. Destpêk: Aborînasi çî ye?
 - 1.1 Derhatina aborînasiyê û aboriyan
 - 1.2 Aborînasiya hemdem û çend dibistanên wê
- 2. Şex arîşeyên metodolojîk yê navendî
 - 2.1 Dijberiya aborînasiya pozîtîv û ya normatîv
 - 2.2 Dijberiya egeran û sedeman
 - 2.3 Xwezaparêziya civakî ya zanistî
 - 2.4 Di aborînasiyê de razberkirin, îdealîzekirin û mercên *ceteris paribus*

- 2.5 Di aborînasî û ekonometriyê de sedemîtî
- 2.6 Binyad û stratejiya aborînasiyê: paradîgma û bernameyên lêkolînê
- 3. Netemamî, mercên *ceteris paribus*, meyldarî, “feraziyeyên nerastîbînkî” û model
 - 3.1 Aborînasiya klasîk û rêbaza pêşbîr
 - 3.2 Friedman û parastina “feraziyeyên nerastîbînkî”
 - 3.3 Model
- 4. Nêzikahîtdanên bandorker li metodolojiya aborînasiyê
 - 4.1 Nêzikahîtdanên Popperî
 - 4.2 Retorîka aborînasiyê
 - 4.3 Di metodolojiya aborînasiyê de “rastîbînparêzî”
 - 4.4 Metodolojiya aborînasiyê û lêkolînên civakî li ser zanistê
 - 4.5 Vekolînên bûyerî
- 5. Teoriya hîlbijartina aqlî
 - 5.1 Aqlîtiya takekesî
 - 5.2 Aqlîtiya pevrayî û hîlbijartina civakî
 - 5.3 Teoriya lîstikê
- 6. Aborînasî û sincnasî
 - 6.1 Kamiranî
 - 6.2 Biriştî
 - 6.3 Di aborînasiya normatîv de meylên din
- 7. Encam
- Bîbliyografi
 - Metodolojiya aborînasiyê
 - Sincnasî û aborînasî
 - Aqlîtî
 - Xebatên din ên ku hatine jêgirtin
- Çavkaniyên din ên li ser înternetê

- Sîteyên înternetê
- Blog

1. Destpêk: Aborînasî çi ye?

Hem pêname û hem jî qada rast a aboriyê di nav felsefeya aborînasiyê de mijarên nîqaşê ne. Di destpêkê de dibe ku zehmetiyên pênamekirina aborînasiyê cidî neyên dîtin. Aborînasî, piştî her tiştî, ji aliyên hilberan, pevguherîn, belavkirin û berxwarina mal û xizmetan ve eleqedar e. Lê ev îdîa û şertên ku dihevine, ne zelal in; û nîqaşbar e ku aborînasî bi tiştên gelekî zêdetir re eleqedar e. Ev jî dibe alîkar ku mirov, berî ku berê xwe bide şiroveyên li ser taybetmendiyên hemdem ên dîsîplînê, xwe nêzî pirsra “Aborînasî çi ye?” bike.

1.1 Derhatina aborînasiyê û aboriyan

Ramana felsefî ya li ser aborînasiyê kevn e, lê qebûlkirina aboriyê wekî heybereke cuda ya lêkolînê, tenê digihîje sedsala 18an. Arîstoteles li ser hin arîşeyan sekiniye ku ji aliyê pir kesan ve wekî têkildarê aboriyê dikarin bên qebûlkin, ku di esasê xwe de arîşeyên di derbarê çawaniya birêvebirina malê de ne. Felsefevanên skolastîk li ser pirsên sincnasiyê yê derbarê reftara aboriyê sekinîne û selexurî, anku faîza diravan, şermezar kirine. Di heyama destpêkê ya modern de bi zêdebûna girîngiya bazirganî û netewe-dewletan re felsefevan û nivîskarên “merkantîlîst” bi giranî bi hevsengiya bazirganiyê û birêzikkirina diravî re eleqedar bûn. Li ser aloziyên rêveberiya darayî ya dewletê û ihtimala ku awayê backirinê û tevgerîna dewletê bandorê li hilberana dewlemendiyê bike têgihîştineke zêdetir hebû.

Di heyama destpêkê ya modern de, kesên ku li ser çavkaniyên dewlemendiya welatekî difikirîn, têdigihîştin ku palehiya salane, mîqdara kelûpelên tîl hilberandin û berhemên maden û masîvaniyê girêdayî rastiya xwezayî, ked û teşebusa takekesî, amûr û tiştên em wekî “malên sermayeyê” bi nav dikin, dewlet û birêzikkirinên civakî ye. Bazirganî jî bihavlî xuya dikir, qet nebe dema ku şert têra xwe baş bûn. Bo qebûlkirina wê ku îmalat û cotkarî dikare bi pêşve bêbirin û hin bac û tarîfe bona

çalakiyên hilberaner dikare ji yên din hindiktir zirardar bibin, ti bizavên têgihî îcab nedikirin. Lê belê, bona formulekirina fikra ku doz dike, tişteki wekî “aborî” tê binavkirin heye û xwediyê birêzîkbûnan e ku dikarin bên lêpîrsîn, pengaveke din a wêrek îcab kir. Bo ku tişteki lêpîrsînbar hebe, divê di hilberan û pevguherînê de hin birêzîkbûn hebin; û bo ku lêpîrsîn ne bi zehmet be, divê ev birêzîkbûnan divê ji wê astê derbas bibe ku bo hilberiyêran, berxweran û pevguherîneran bixwe aşkere ye. Tenê di sedsala 18an de, herî zelal di xebatên Cantillon, fîzyokratan, David Hume, û nemaze Adam Smith (bnr. entriya li ser felsefeya exlaqî û siyasî ya Smith) de, mirov rastî fikra ku dibêje hin zagonên li benda kişîkirinê hene, ku komeke tevlihev a hevbandoriyên ku malên berxwarinê û çavkanî û amûrên ku wan hildiberînin hem hildiberînin û hem jî belav dikin, bi rê ve dibin (Backhouse 2002).

Bo ihtimala heybereke civakî ya lêpîrsîna zanistî, fikra şopandina encamên bêqestî yên çalakîyên biqestî yên takekesan e. Ji ber vê yekê, bo nimûne Hume, zêdebûna di bihayên de ku piştî zêdebûna yekeya diravê derdikevin holê û di çalakîyên aboriyî de zêdebûnên demkî, beriya her tiştî bi tîgîşk û kiryarên takekesên ku beriya kesên din diravan xerc dikin ve girê dide (1752). Bi xerckirina zêrên xwe yên zêde ku ji derve tîn îthalkirin, bazirgan, naxwazin asta bihayên bilindtir bikin. Lê, dîsa jî tiştê ku dikin, ev e. Adam Smith, di *Inquiry into the Nature and Causes of the Wealth of Nations* de vê hûrbîniyê berfireh û bêqisûr dike û sistematîkekê pêşniyaz dike. Smith, ji vegotina xwe ya li ser mirina feodalîzmê (1776, Book II, Beş: 4) heta nîqaşa xwe ya navdar a destê nedîtbar balê dikêşe ser encamên bêqestî. “Ew, tenê qezenca xwe armanc dike; û ew di vê rewşê de, wekî gelek rewşên din, ji hêla destekî nedîtbar ve ber bi encamekê tê birin, ku qet ne parçeyekî nêta wî bû. Ne jî, bo civakê her tim ne xerabtir e ku ew ne parçeyekî wê bû. Bi rêya şopandina berjewendiya xwe, ew, pir caran ji asta ku bi rastî dixwaze zêdetir piştgiriya dide civakê” (1776, Book IV, Beş: 2). Hebûna birêzîkbûnan, ku encamên bêqestî yên hîlbijartinên takekesî ne, bo lêkolîna zanistî heyberekê derdixe holê.

Mirov dikare yan bi diyarkirina hin faktorên sedemî yan jî bi diyarkirina hin cureyên diyardeyan qada aborînasiyê ji qada lêkolînên din ên civakî yên zanistî cuda bike. Diyardeya ku aborînas pê re eleqedar dibin, hilberan, berxwarin, belavkirin û

pevguherîn in, bi taybetî bi rêya bazaran. Lê belê, çiku tevî zagonên termodînamîkê, metalûrjiyê, erdnîgariyê û normên civakî, heta zagonên rêvebirina dehanê gelek faktorên sedemî yên cuda bi van re têkildar in, nabe ku aborînasî *tenê* bi diyardeyên ku li ser lêkolînan dike ji qadên din ên lêkolînê were cudakirin. Hin kes referansê didin hinek faktorên sedemî yên navendî ku pêdivî pê heye. Ji ber vê yekê, wekî mînak John Stuart Mill, ev yek doz kiriye: “Aboriya siyasî... bi diyardeya dewleta civakî ve eleqedar dibe, ku wekî encama lêgerîna dewlemendiyê derketiye holê. Ew, ji xeynî yên ku dikarin wekî rêgezên tim û tim dijberî daxwaza dewlemendiyê bîn qebûlkin, bi navkî jêrevîna kedê, û daxwaza îroyîn a zewqên bihadar, hemû arezû û handerên din ên mirovî bi temamî razber dike” (1843, Book VI, Beş: 9, Section 3). Di nêrîna Mill de, aborînasî, di esasê de bi encamên lêgerîna takekesane ya dewlemendiya daringî re eleqedar e, lê belê hin vegotinên derbarê handerên kêmtir girîng, wekî jêrevîna kedê, jî vedihewîne.

Mill, wekî xwezayî dihesibîne ku takekes di lêgerînê xwe yên dewlemendiyê û debdebeyê û di jêrevînê kedê de ne bi awayekî belawela û bêrêkûpêk lê bi awayekî aqlî tevdigerin, lê belê ne teoriyeke wî ya berxwarinê û ne jî teoriyeke zelal a hîlbijartina aqlî ya aboriyî heye, û teoriya wî ya terxana çavkaniyan jî gelek jar e. Ev valahiyan di dema bi navê şoreşa nûklasîk an marjînalîst de gav bi gav hatin tijekirin, ku hîlbijartina hin tiştên berxwarinê (û bihayê wan) ne bi havila wan a tevahî lê bi havila wan a marjînal ve girê dabû. Bo nimûne, av teqez pir havildar e, lê li piraniya cîhanê ew qas zêde ye ku qedehek kêr an zêde bo ajankê ne girîng e. Ji ber vê jî av erzan e. Aborînasên “nûklasîk” yên ewil ên wekî William Stanley Jevons doz kirine ku ajan bona ku bextewariyên xwe zêdetirîn bikin hîlbijartinên berxwarinê dikin (1871). Ev tê wê wateyê ku ajan, xerckirinê xwe bi awayekî dabeş dikin ku hemû tiştên ku bi bihayê dolarekî dikirin bo bextewariya wan heman tevkarîyê dikin; çî av be, çî şorbek be û çî jî rûpoşek be. “Havila marjînal” a her tiştê ku bi bihayê dolarekî tê kirîn wekhev e.

Di sedsala 20an de, aborînasan ev teorî ji kincên wê yên hedonîstîk fîlitandin (Pareto 1909, Hicks and Allen 1934). Aborînas, li şûna ku girîman bikin ku hemû hîlbijartinên berxwarinê dikarin li gorî mîqdara zêdekirina bextewariya ajan bîn

radekirin, li radekirinê bixwe hûr bûn. Tiştê ku ew di debarê nirxandinan de girîman dikin ew e ku, ajan dikarin vebijarkên ku derdikevin hemberî wan bi berdewamî rade bikin. Ev, hevtayê girîmankirina pêşîn e, ku radekirinan temam dibîne – ango, bo hemû du vebijarkên x û y ku ajan dihizire, ajan an x *li ser* y re bi cih dike (x ’ê *tercîha* y ’yê *dike*) an y ’yê *tercîha* x ’ê *dike*, an jî ajan bêpêwend e. Ya duyem, aborînas girîman dikin ku radekirinên ajanan ên vebijarkan (*tercîhan*) têper in. Dema em dibêjin *tercîhên* ajaneke têper in, bi heman îdîayên derbarê bêpêwendiyê de û kombînasyonên bêpêwendiyê û *tercîhê*, em îdîa dikin ku heke ajan x ’ê *tercîha* y ’yê *bike* û y ’yê jî *tercîha* z ’yê *bike*, naxwe ajan x ’ê *tercîha* z ’yê *dike*. Her çend bo ku teoriyê li vebijarkên bêsînor şamil bikin û şert û mercên aqlîtiyên berbiçav ên di derbarê qumarê de vehewînin şertên din ên teknîkî hebin jî, aborînas, bi gelemperî, nêrînekê wisa dipejirînin ku doz dike da ajaneke aqlî qet nebe xwedî *tercîhên* temam û têper in û ji nav vebijarkên gengaz de yê herî sepanbar hildibijêrin. Di teoriya *tercîhên* diyarkirî de, aborînasan hewl dane ku hemû referansên bo *tercîha* kirdeyî ji holê rakin an jî *tercîhê* di çarçoveya vebijarkan de pênase bikin, lê bi ser neketine (Samuelson 1947, Houthaker 1950, Little 1957, Sen 1971, 1973, Hausman 2012, beş: 3).

Aborînasan, bo zelalkirina nêrîna aqlîtiyê ya ku ajaneke aboriyî karakterîze dike, veqetandina aboriyê ji lêpîrsînên din yê civakî domandine, ku ev veqetandin piranî li gorî naveroka handeran *tercîhên* têkildar e. Ji ber vê yekê her çend mirov dikarin bi zahidiyê ji bextewariyê bigerin, an bi awayekî maqûl hildibijêrin ku hemû tiştên xwe yê cihanî qurbana sedemeke siyasî bikin jî, aborînas girîman dikin ku *tercîhên* bi vî rengî pir kêmtir in û bo aborînasiyê ne girîng in. Aborînas, tevî diyardeyên ku ji aqlîtiyê tînin dariştin, bi xwesteka bo dewlemendiyê û pakêtên mezintir ên mal û xizmetan re eleqedar dibin.

Aborînasan, bi karakterîzekirineke kurttir a handaniya takekesî û bi nêrîneke berfirehtir a qada aborînasiyê re flort kirine. Di monografa xwe ya bandorker *An Essay on the Nature and Significance of Economic Science* de Lionel Robbins aborînasî wekî “zanista ku reftara mirovan di çarçoveya têkiliyeke di navbera armancan û amûrên qitûd ên xwediyê bikaranînê cuda de dikole” pênase kiriye (1932, r. 15). Li

gorî Robbins, aborînasî bi tiştên wekî hilberan, pevguherîn, belavkirin an berxwarinê re eleqedar nîne. Li şûna wê, ew, bi nêrîneke derbarê hemû kirdariyên mirovî re eleqedar dibe. Pênaseya Robbins alîkariya mirov dike da hewldanên bo sepandina têgeh, model û teknîkên aborînasîyî li mijarên din ên wekî dahûrandina reftarên dengdanê û zagongeriyê fehm bikin, her çend ku aborînasî girêdanka xwe bi qada kevneşopîyî ve didomîne jî.

1.2 Aborînasiya hemdem û çend dibistanên wê

Aborînasiya hemdem cihêreng e. Gelek dibistan û gelek şax hene. Heta, aborînasiya bi navê “ortodoks” an “sereke” jî xwediyê gelek guhartoyan e. Hin aborînasîyên sereke pir teorîk in, lê piraniya wê sepandinî ye û xwe dispêrin teoriya seretayî. Xebatên teorîk û sepandinî, dikarin wekî mîkroaborînasî û makroaborînasî ji hev bîn veqetandin. Di heman demê de şaxeke sêyem ango ekonometrî jî heye ku li ser pêşbîniya azmûnî, ravekirin, û heta astekê testkirina modelên mîkroaborînasîyî û makroaborînasîyî disekine (lê belê bnr. Summers 1991 and Hoover 1994).

Mîkroaborînasî, li ser têkiliyên di navbera takekesan de hûr dibe (bi fîrma û malbatan re ku pirî caran wekî takekesên rûmetdar tene qebûlkirin û li ser îdiyosînkasiyên daxwaza takekesên diyar kêmtir tiştên gotin). Takekes, xwedî tercîhên tekûz û têper in, ku hîlbijartinên xwe bi rê ve dibin. Berxwer, tiştên zêdetir tercîha tiştên kêmtir dikin û “rêjeyên marjînal ên kêmtir ên guherînê” bi dest dixin, ango heke di destê wan de ji heman tiştî zêde hebin dê bo her yekeyekê kêmtir diravan bidin, û heke heman tişt kêmtir hebe dê zêdetir diravan bidin. Fîrma hewl didin ku li hemberî kêmtirbûna jêhatinan karê xwe zêde bikin: heke ji xeynî yekê hemû ketanên di pêvajoya hilberanê de neyên guhertin, ketanê mayî çî qas zêde be dê deran jî ew qas zêde be, lê bi rêjeyeke kêmtir. Aborînasî îdealîze û girîman dikin ku li bazarên hevrikîdar, fîrma û takekes nikarin bandorê li bihayên bikin, lê aborînasî bi têkiliyên stratejîk re jî eleqedar dibin, ku hîlbijartinên aqlî ên takekesên cuda bi hev ve girêdayî ne. Di nava aborînasîyê de girîngiya teoriya lîstîkê, ku li ser lêkolîna hevbandoriyên stratejîk disekine, roj bi roj zêde dibe. Aborînasî, encama çalakiyên firmayan ên bo zêdetirînkirina karên xwe û hewldanên berxweran ên,

wekî *hevsengiyekê* ku tê de li ti bazaran daxwaza zêde nîne, armanc dîkin da bi awayekî optîmûm ji tercîhên xwe tetmînê bistînin model dîkin. Wateya vê ew e ku her kesê ku dixwaze tiştekî bi bihayê bazarê bikire, dikare bikire. Daxwazeke zêde nîne û heta ku malek belaş nebe, ti derpêşa zêde jî nîne.

Makroaborînasi, bi têkiliyên di navbera komelên aborî de, wekî têkiliyên di navbera derpêşa diravan û rêjeya faîzê an rêjeya mezinbûnê mijûl dibe, bi taybetî li ser arîşeyên derbarê çerxa karsaziyê û bandora siyaseta diravî û darayî ya li ser encamên aboriyê disekine. Gelek aborînasên sereke dixwazin makroaborînasiyê û mîkroaborînasiyê bikin yek, lê gelek kêma aborînas ji hewldanên bi vî rengî tetmîn bûne, bi taybetî ji yê bi navê “ajanên temsîlî” hatine kirin (Kirman 1992, Hoover 2001a). Makroaborînasi, yekser bi siyaseta aboriyê re eleqedar e, û ji ber vê jî (û bi awayekî ne ecêb) li gorî mîkroaborînasiyê û ekonometriyê duçarê îhtilafên germtir (û siyasî) bûye. Di nav dibistanên makroaborînasiyê de Keynesî (û “nû-Keynesî”), monetarîst, “aborînasiya nû-klasîk” (teoriya bendewariyên aqlî - Begg 1982, Carter and Maddock 1984, Hoover 1988, Minford and Peel 1983) û teoriyên “çerxa karsaziyê ya rastîn” (Kydland and Prescott 1991, 1994; Sent 1998) hene.

Şaxên aborînasiya sereke jî li ser pirsên diyar ên der barê mezinbûnê, darayî, îstihdam, çandinî, îskan, çavkaniyên xwezayî, bazirganiya navdewletî û hwd. De disekinin. Di nav aborînasiya ortodoks de jî gelek nêzikahîtdanên cuda hene, wekî *teoriya wekaletê* (Jensen and Meckling 1976, Fama 1980), *dibistana Chicago* (Becker 1976), an jî *teoriya hilbijartina giştî* (Brennan and Buchanan 1985, Buchanan 1975). Ev dibistanan, pirsên derbarê teşwîqên di nava firmayan û malbatan da û rêyên ku sazî rêberiya hilbijartinan pêk tînin rave dîkin.

Tevî ku aborînasiya sereke serdest e û herî zêde balê dikişîne jî, gelek dibistanên din hene. *Aborînasên Awistiryayî* nêrînên ortodoks ên hilbijartin û zêfanan qebûl dîkin, lê belê ew li ser nediyariyê û pîrsa ka divê mirov encaman wekî hevsengiyê bibîne an na disekinin, û di derbarê nirxa modelkirina matematîkî de gumanbar in (Buchanan and Vanberg 1989, Dolan 1976, Kirzner 1976, Mises 1949, 1978, 1981, Rothbard 1957, Wiseman 1983, Boettke 2010, Holcombe 2014, Nell 2014a, 2014b, 2017, Boettke and Coyne 2015, Hagedorn 2015, Horwitz 2015, Dekker 2016,

Linsbichler 2017).

Aborînasên sazîgerîparêz ên kevneşop, pirsîyariyê li nirxa teorîzekirina giştî ya razber dikin û balê dikişînin têgehên peresanî (Dugger 1979, Wilber and Harrison 1978, Wisman and Rozansky 1991, Hodgson 2000, 2013, 2016, Hodgson and Knudsen 2010, Delorme 2010, Richter 2015). Ew, balê dikişînin girîngiya gelemperîkirinê derbarê norm û reftarên di nav saziyên taybet de. Di aborînasiya sazîgerîparêz de xebatê sepanî, carinan pir dişibe aborînasiya ortodoks a sepanî. Di qada aborînasiyê de xebatên herî dawî wekî sazîgerîparêz jî tên binavkirin û hewl didin ku taybetmendiyan saziyan bi balkişandina lêçûnên kirariyan, netemamiya bivênevê ya peymanan, û arîşeyên ku “muwekîl” di çavdêrîkirin û rêvebirina ajanên xwe de rû bi rû dimînin rave bikin (Coase 1937; Williamson 1985 ; Mäki *et al* 1993 , Bakur 1990 ; Brousseau and Glachant 2008).

Aborînasên Marxî û sosyalîst, bi kevneşopî teoriyên aboriyê yên Karl Marx anîne ziman û bi pêş ve birine, lê belê di demên dawî de gelek aborînasên sosyalîst, têgeh û babetên Marxî ên kevneşop bi amûrên ku ji teoriya ortodoks a aboriyê deyn kirine guhertine (Morishima 1973, Roemer 1981, 1982, Bowles 2012, Piketty 2014, Lebowitz 2015, Auerbach 2016, Beckert 2016, Jacobs and Mazzucato 2016).

Ji xeynî van dibistanan ev jî hene: *Sosyo-aborînas*, bi normên ku hîlbijartinan bi rê ve dibin re eleqedar dibin (Etzioni 1988, 2018), *aborînasên reftarî*, ku li ser xala girîngtirîn a reftara hîlbijartinê dixebitin (Winter 1962, Thaler 1994, Ben Nér and Putterman 1998, Kahneman and Tversky 2000, Camerer 2003, Camerer and Loewenstein 2003, Camerer *et al.* 2003, Loewenstein 2008, Thaler and Sunstein 2008, Saint-Paul 2011, Oliver 2013), post-Keynesî, ku li xebatên Keynes û nemaze li balkişandina wî ya li ser daxwazê hûr dibin (Dow 1985, Kregel 1976, Harcourt and Kriesler 2013 Rochon and Rossi 2017), *aborînasên peresanî*, ku balê dikişînin ser girîngiya saziyan (Witt 2008, Hodgson and Knudsen 2010, Vromen 2009, Hodgson 2013, 2016, Carsten 2013, Dopfer and Potts 2014, Wilson and Kirman 2016), *nû-Ricardoyî*, ku balê dikişînin ser têkiliyên di navbera çînen aboriyê de (Sraffa 1960, Pasinetti 1981, Roncaglia 1978), *noro-aborînas*, li ser encamên xwezayî yên norolojîk ên reftara hîlbijartinê dixebitin (Camerer 2007, Camerer *et al.* 2005,

Camerer *et al.* 2008, Glimcher *et al.* 2008, Loewenstein *et al.* 2008, Rusticinni 2005, 2008, Glimcher 2010). Aborînasî, ne peyaneke homojen e.

2. Şeş arîşeyên metodolojîk yên navendî

Her çend şax û dibistanên cuda yên aborînasiyê di derbarê wê de gelek arîşeyên curbicur ên epîstemolojîk û ontolojîk derxistibin holê jî, li gorî vê wateya felsefî, di ramana metodolojîk de şeş arîşeyên navendî hene:

2.1 Dijberiya aborînasiya pozîtîv û ya normatîv

Çêkerên siyasetê, bo rêvebirina siyasetê li aborînasiyê dinêrin, û ev bivênevê xuya dike ku arîşeyên herî ezoterîk ên aborînasiya teorîk jî dikarin bi berjewendiyên daringî yên hin kesan re eleqedar bibin. Asta ku aborînasî bi fîkarên normatîv re eleqedar dibe û belkî ji wan bandorê digire, di navbera zanista *pozîtîv* ku bi “rastîyan” ve mijûl dibe û li ser nirxan û divêtiyan lêpîrsîneke *normatîv* pîrsên metodolojîk derdixe holê. Piraniya aborînasan û metodolojîstan bawer dikin ku di navbera rastîyan û nirxan de cudahiyeke ku bi awayekî maqûl aşkere heye, di navbera tiştê heyî û yê ku divê hebe, û ew bawer dikin ku piraniya aborînasiyê divê wekî zanistêke pozîtîv were qebûl kirin, ku bo pêkanîna armancên xwe di hilbijartina amûran de alîkariya çêkerên siyasetê dikin, tevî ku ew bandorê li hilbijartina armancan bixwe nake.

Ev nêrîn, ji ber çend sedeman nîqaşbar e (Mongin 2006, Hausman, McPherson, and Satz 2017). A yekem, divê aborînas, taybetmendiyên netemam ên armanc û zêfanên ji hêla çêkerên siyasetê hatine pêşkêş kirin şirove bikin û bînin ziman (Machlup 1969b). A duyem, “zanista” aboriyî çalakiyeke mirovî ye, û mîna hemû çalakiyên mirovî, li gorî nirxan tê birêvebirin. Ev nirx ne divên ku bi nirxên bandorê li siyaseta aboriyî dikin ve hevta bin, lê belê ev xal nîqaşbar e ka nirxên ku çalakiya aborînasan bi rê ve dibin dikarin ji nirxên ku çêkerên siyasetê bi rê ve dibin bi awayekî berbiçav bînin veqetandin. A sêyem, piraniya aborînasiyê li dora teoriya normatîv a aqlîtiyê hatiye avakirin. Mirov dikare bipirse bê ka nirxên di nava teoriyên wiha de nixumandî dikarin ji nirxên ku siyasetan bi rê ve dibin bi awayekî tûj bînin

veqetandin an na. Bo nimûne, dibe ku zehmet be mirov nêrîneke ku aqlîtiya takekesî zêdetirîn dike biparêze, û di heman demê de jî israr bike ku siyaseta civakî divê li dijî zêdetirînkirina mezinbûnê, dewlemendiyê an jî kamiraniyê li ser navê azadî, maf an wekheviyê bisekine. A çarem, nêrînên mirovan ên derbarê rastiye û çewtiye de, bi rastî, ji baweriya wan a derbarê ka mirov di rastiye de çawa tevdigerin bandorê digirin. Hin delîl hene ku xebitîna li ser teoriyên ku takekesan wekî berjewendîhez pênase dikin, rê li mirovan vedike da reftarên berjewendîhez zêdetir biparêzin û bixwe jî hîn zêdetir bibin berjewendîhez (Marwell and Ames 1981, Frank *et al.* 1993). A dawîn, darazên mirovan di bin siya berjewendiyên wan de ne. Çiku teoriyên aborînasiyê bi awayekî ew qas navendî bi berjewendiyên mirovan re eleqedar in, bivênevê dê di nava dîsîplînê de meylên îdeolojîk hebin (Marx 1867, Preface). Pozîtîv û normatîv di nava aborînasiyê de bi taybetî pevtêkildar in, çiku aborînas hemû ne lêkolîner û mamoste ne. Her wiha aborînas wekî şirovekaran dixebitin û mirov dibêje qey “çekên kirêkirî” ne; ku destheqên wan bi destxistina encamên ku kardêrên wan jê dixwazin ve girêdayî ye. Polemîkên tûj ên derbarê bersivên siyaseta makroaborînasiyê ên derbarê resesyona mezin a ku di 2008an da dest pê kiriye, bandora îdeolojiyê destnîşan dike.

2.2 Dijberiya egeran û sedeman

Mîkroaborînasiya teorîk a ortodoks, çî qas teoriyeke hîlbijartinên aqlî be, ew qas jî teoriyek e ku encamên aboriyê rave û pêşbîn dike. Çiku hema hema hemû teoriyên aborînasiyê yên ku hîlbijartinên takekesî nîqaş dikin qebûl dikin ku takekes bona sedeman tevdigerin, û sewa vê jî bi awayekî aqlî ne, pirsên li ser rola ku ramanên aqlîtiyê û sedeman di nava aborînasiyê de divê bilîzin bi gelemperî xwediyê girîngiyekê ne. Aborînas, bi adetî ji çalakiyên takekesên taybet zêdetir bi hemû encamên hîlbijartinên takekesî re eleqedar in, lê belê teoriyên wan di rastiye de hem li ser sedemên hîlbijartinên takekesan ravekirinên sedemî û hem jî vegotinên li ser *sedemên* hîlbijartinên wan pêşkêş dikin. Her wiha ji entriyên li ser takekesîparêziya metodolojîk û egerên çalakiyê jî binêrin: peyitandin, handan, ravekirin.

Ravekirinên di warê egeran de xwedî çend taybetmendiyan e ku wan ji

ravekirinên di warê sedeman de vediqetînin. Eger, hewl didin da çalakiyên ku rave dikin *bipeyitînin*, û bi rastî bi navê “egerên derekî” (Williams 1981) tenê çalakiyan dipeyitînin, bêyî ku hewl bidin da wan rave bikin. Eger, dikarin bên nirxandin, û ew li hember rexneriyê bersivdar in. Eger, berevajîya sedeman, divê bo kesên ku dibine eger fehmbar bin. Li ser bingeheên wiha, gelek felsefevanan pirsîne ka gelo ravekirinên çalakiya mirovan dikarin bibin ravekirinên sedemî an na (von Wright 1971, Winch 1958). Dîsa jî, heke eger bi rastî ne “karîger” be, tenê dayîna egerekê -heta, egereke pir baş jî- nikare çalakiya ajanekî rave bike. Wekî mînak, dibe ku kesek dest pê bike û bi rêk û pêk biçe dêrê, û wekî egera xwe jî fikariya xelasbûnê nîşan bide. Lê belê, dibe ku kesên din guman bikin ku ev ajan xwe dixapîne, û di rastiyê de berpirsiyarê vê eleqeya nûkirî ya li hember dîn keça wezîr a dîlkêş e. Donald Davidson (1963) doz kiriye, tiştê ku egerên dikarin çalakiyekê rave bikin ji yên nikarin rave bikin vediqetîne ew e ku yên pêşîn di heman demê de sedemên çalakiyê ne jî. Her çiqas têgihîştina aqlîtiyê ya di aborînasiyê de ji hin hêlan ve ji derûnnasiya xelkî ku mirov bo ravekirina çalakiyên rojane serî lê dixê cihê bibe jî, piraniya heman pirsan li vir jî hebûna xwe didomînin (Rosenberg 1976, beş: 5; 1980, Hausman 2012).

Cudahiyeke din di navbera ravekirinên di warê egeran û yên di warê sedeman de, ku hin aborînasan bal kişandiye ser, ew e ku dibe bawerî û tercîhên ku çalakiyan rave dikin xwe bispêrin xeletî û nezaniyê (Knight 1935). Wekî nêzikahîtdaneke pêşîn, aborînas dikarin xwe ji zehmetiyên wiha ku ji biqestîtiya baweriyê û arezûyê derdikevin holê dîr bigirin. Ew, bi vî rengî pir caran têw dikin ku mirov di der barê hemû rastiyên têkildar de xwedî agahiyên tekûz in. Bi vî awayî, nedivê ku teorîsyen bo baweriyên mirovan xem bixwin. (Eger mirov xwedî agahiyên tekûz bin, naxwe ew ku çi rastî be bi wê bawer dikin û li benda wê dibin.) Lê belê dema mirov carekê ji vê nêzikahîtdana pêşîn derbas dibe, hin zehmetî derdikevin holê ku di zanistên xwezayî de hevhesûyê wan nîne. Hilbijartin, girêdayî wê ye ka tişt “ji hundir ve” çawa xuya dikin, ku ew jî dikare ji rewşa rastîn a tiştan pir cudatir be. Bo nimûne, borseya bifikirin. Nirxa “rastî” ya hebek seneda pardariyê, bi qezencên pêşerojê yên şîrketê ve girêdayî ye, ku bê guman nediyar in. Di sala 2006an de li DYAyê bihayên xaniyan pir hatin bilindkirin. Lê gelo ew “zêde bilind” bûn an na, qet nebe

di maweya kurt de, girêdayî baweriya mirovan bû. Heke mirov bikaribiya xaniyan bifiroşe kesên din ên dixwastin hîn zêdetir diravan bidin, wê bûbûya veberhênanên tekûz. Aborînas, li ser girîngiya vê kirdeyîtiyê li hev nakin. Endamên dibistana Awisturyayî doz dikin ku ev cudahiyan pir girîng in, û teorîzekirina aborînasiyê ji teorîzekirina hema yek ji zanistên xwezayî ve bi awayekî tûj vediqetînin (Buchanan and Vanberg 1989, von Mises 1981).

2.3 Xwezaparêziya civakî ya zanistî

Di nav hemû zanistên civakî de, ya ku herî zêde dişibe zanistên xwezayî aborînasî ye. Teoriyên aborînasiyê hatine aksiyomatîzekirin û gotar û pirtûkên aborînasiyê bi teoreman tijî ne. Di nav hemû zanistên civakî de tenê aborînasî, bi xelateke ku cihê Nobelê digire, pesnê xwe dide. Ji ber vê, aborînasî, bo kesên bi asta hevrengeyên di navbera zanistên xwezayî û civakî de eleqedar dibin bûyereke testê ye. Ew kesên meraq dikin ka gelo zanistên civakî divê ji zanistên xwezayî bi awayekî bingeîn cuda bin an na, xuya ye ku di esasê de bi sê pirsan re eleqedar dibin:

(i) Gelo di navbera binyad an têgehên teorî û ravekirinên zanistên xwezayî û yên civakî de ti cudahiyeke bingeîn hene? Jixwe behsa hinek ji van mijaran di nîqaşa li ser dijberiya egeran û sedeman de hatibû kirin.

(ii) Gelo di armancan de ti cudahiyeke bingeîn hene? Felsefevan û aborînasan doz kirine ku ji xeynî an li şûna armancên pêşbînî û raveker ên zanistên xwezayî, zanistên civakî divê armanc bikin da bo me *têgihîştinê* peyda bikin. Weber û yên din doz kirine ku zanistên civakî divê ji me re têgihîştineke “ji hundir” peyda bikin, da em bikaribin bi bertekên ajanan re hemdiliyê bikin û tiştên diqewimin “fehmbar” bibînin (Weber 1904, Knight 1935, Machlup 1969a). Ev (û qebûla ji nêzik ve têkildar ku doz dike da ravekirin ji tenê sedeman zêdetir egeran jê digire), xuya dike ku hêmaneke kirdeyîtiyê dixê nava zanistên civakî, ku di zanistên xwezayî de nayê dîtin.

(iii) Sewa girîngiya hilbijartinên mirovî (an jî belim vîna azad), gelo diyardeyên civakî bo ku di nava çarçoveyeke zagon û teoriyan de were girtin zêde bêpergal in?

Dema vîna azad a mirov dide ber çavan, belim reftarên mirovan bi awayekî xwezayî nepêşbînbar in û ne kirdeyê ti zagonan in. Lê di rastiyê de, di çalakiya mirovan de gelek birêzîkbûn hene, û dema mirov têkilheviya mezin a sedemî ku hin pergalên xwezayî pênase dikin bide ber çavan, zanistên xwezayî jî divê bi gelek bêrêzîkbûnan re têbikoşin.

2.4 Di aborînasiyê de razberkirin, îdealîzekirin û mercên *ceteris paribus*

Aborînasi, derbarê meşrûiyeta razberkirin û îdealîzekirina giran de pirsan derdixe holê. Bo nimûne, modelên aborînasiyê yên sereke bi gelemperî dihesibînin ku her kes bi awayekî tekûz aqlî ye û xwedî agahiyên tekûz e an jî mal bi awayekî bêdawî dikarin bê dabeşkirin. Îdîayên bi vî rengî pirole ne, û bi awayekî aşkere xelet in. Dibistanên din ên aborînasiyê belim îdealîzekirinên ew qas tundrew bi kar nînin, lê heke mirov dil neke ku ji gelek tevliheviyan sadekirinên giran û razberkirinan çêbike, ne pêkan e ku aborînasi were çêkirin. Çiqas sadekirin, îdealîzekirin, razberkirin an “îzolasyon” (Mäki 2006) meşrû ye?

Wekî din, çiku aborînas hewl didin ku li ser diyardeyên aborînasiyê wekî avakirina qadeke cuda bixebitin, tenê di bin bandora hejmareke kêma faktorên sedemî de, îdîayên aborînasiyê tenê di bin mercên *ceteris paribus* de rast in; ango, tenê heke ti destwerdan û sedemên tengezar tunebin, ew rast in. Mercên *ceteris paribus* çi ne, û heke pêkan e ku di zanistê de meşrû bin, naxwe kengî? Pirsên derbarê mercên *ceteris paribus*, bi pirsên di derbarê sadekirin û îdealîzekirinan de jî nêz ve girêdayî ne, lewra yek ji awayên sadekirinê, girîmankirin e ku sedemên tengezar an jî destwerdan ên têvel ne çalak in, û kişîkirina encamên faktorên sedemî yên biçûk e. Ev mijaran û pirsên têkildar a ku dipirse ka aborînasi ji aliyê delîlan ve çiqas baş hatiye piştgirîkirin, di metodolojiya aborînasiyê de bûne pirsên *navendî*. Ew mijaran dê li jêr, û bi piranî di Beşa 3yan de werin nîqaşkirin.

2.5 Di aborînasî û ekonometriyê de sedemîti

Di aborînasîyê de gelek gelemperîkirinên girîng îdîayên sedemî ne. Bo nimûne, zagona daxwazê îdîa dike ku zêdebûna bihayê (*ceteris paribus*) dê mîqdara ku tê xwestin kêmtir bike. (Ew, tenê di navbera biha û daxwazê de têkiliyeke berevajî îdîa nade. Dema daxwaz sewa hin sedemên din zêdetir dibe, wekî guhertina tehmê, biha zêdetir dibe.) Ekonometrînas, bi ihtimalên diyarkirina têkiliyên sedemî ji delîlên statîstîkî û bi eleqeya têkiliyên sedemî li hember ihtimala pêşbînkirina hevgirtî ya nîrxên parametreyî bi kûrahî eleqedar bûne. Çi ku fikarên li ser encamên siyasetên vebijark bo aborînasîyê ew qas navendî ne, lêpîrsîna sedemî bivênevê ye.

Beriya salên 1930an, aborînas bi gelemperî amade bûn ku zimanê sedemî û bi awayekî aşkere û rastîn bi kar bînin, tevî hin fikarên ku belim di navbera dahûrandinên sedemî yê guherînên aboriyî û lêkolînên “statîka berawirdî” yê rewşên hevsengiyê de nakokiyek çêbe. Hin aborînas di heman demê de xem dixwarin ku hizirkirina di warê sedeman de û di hevsengiya aboriyî de naskirina pirayî û dualîtiya diyarkirinê li hev nayê. Di hawirdora hizrî ya dij-metafizîkî ya salên 1930 û 1940î de (ku pozîtîvîzma mentiqî qet nebe semptomatîk bû), her behsa sedemîtiyê gumanbar dibû, û aborînasan bi gelemperî xwe ji têgehên sedemî dûr digirtin. Encam ew bû ku wan dev ji hizirîna baldar a li ser têgehên sedemî berdane, ku bi awayekî veşartî serî lê dixistin (Hausman 1983, 1990, Helm 1984, Runde 1998). Bo nimûne, aborînasan, li cihê ku zagona daxwazê di warê encamên sedemî yê guherînên bihayê bo mîqdara tê xwestin formule bikin, hewl dan ku xwe bi nîqaşên li ser fonksiyona matematîkî ya têkildarî bihayê û mîqdara tê xwestin sînordar bikin. Îstîsnayên girîng hebûn (Haavelmo 1944, Simon 1953, 1953, Wold 1954), û di dema nîfşê borî de, ev rewş bi awayekî giran guherî.

Bo nimûne, Kevin Hoover di *Causality in Macroeconomics* (2001b) de bo lêpîrsîna pîrsên sedemî yê mezin rêbazên çêbûnbar ava kirine, wekî ka guherînên di derpêşa diravê (M) de di rêjeya enflasyonê de (P) dibe sedema guherînê yan guherînên di P de bi awayên din hatine çêkirin vedihewîne an na. Heke guherînên di M de dibe sedema guherînên di P de, hingê divê belavkirina mercî ya P li ser M bi guherînên derekî ên di M de re mîna xwe bimîne, lê belê divê bi guherînên derekî ên

di P de re biguhere. Hoover doz dike ku lêpirsîna dîrokî, ku ji hêla lêpirsîna statîstîkî ve tê piştgirîkirin, dikare wê encamê bipeyitîne ku di M an P de hin guherînên taybet derekî ne. Naxwe, mirov dikare bi ceribandina biîstikrariya belavkirinên mercî îstiqameta sedemî diyar bike. Ekonometrînasan bo vejîna hemdem a eleqeya felsefî li hember têgihîştina sedembûnê tevkariyên heyatî kirine. Ji xeynî xebata Hoover, bo nimûne ji Geweke (1982), Granger (1969, 1980), Cartwright (1989), Sims (1977), Zellner and Aigner (1988), Pearl (2000), Spirtes, Glymour and Scheines (2001) jî binêrin.

Bo diyarkirina têkiliyên sedemî rêyeke bi dîmaneyî ewletir, bi ceribandinên kontrolkirî yên rasthatinî ye. Heke azmûnker, kirdeyan bi awayekî rasthatî têxe nav komên azmunî û kontrolî, û tenê faktorekî biguherîne, wê demê, heta ku bêşansiyek çênebe dê her du kom bi awayên nenasbar ji hev cihê bin, di bin mercên heyî yên komên azmunî û kontrolî de guherînên di encaman de divê ji ber cudahiya di faktorekî de pêk bên. Bi rastî, di rewşa guherbarên çendanî de, mirov dikare bandorên sedemî yên navînî bihesibîne (Deaton 2010). Ev, ceribandinên kontrolkirî yên rasthatinî pir dîlkêş dike, lê nabe dermanê her derdî, çiku komên azmunî û kontrolî belim nebin nûnerên nifûsa ku siyasetmedar hêvî dikin ku encamên sedemî li ser bîsepînî, û encamên sedemî yên mudaxaleyê belim di bin komên cuda yên komên kontrolî û azmunî de ji hev cuda bibin (Worrall 2007, Cartwright and Hardie 2013).

Bo egerên kirdariyî û sincnasiyî, pirî caran zehmet e ku di aborînasiyê azmûn bîn çêkirin (lê, wekî di beşa 4.5 de hatiye nîqaşkirin, ji bêîmkaniyê dûr e). Lê belê, bi hinek hostatî û li hember azmûnê heweseke ji ya berê zêdetir, aborînas hem di laboratuwarê de hem jî di qadê de ji berê pir zêdetir azmûnan çêdikine. Bi ser de, wekî cîgirekî azmûnê, an wekî rêbazeke berfirehtirkirina sînorên li ser azmûnê, aborînas, di van salên dawî de li hember teknîkên bi navê “guherbarên navgînî” pir heweskar bûne. Bo nimûne, tenê vekolîna pevtêkildariya di navbera mezinbûna aboriyî û alîkariya pêşveçûnê de, heta kontrolkirina faktorên din ên ku tê zanîn bandorê li mezinbûna aboriyî dikin, ne mimkun e ku bandora sedemî ya alîkariyê li ser mezinbûnê aşkere bike. Çiku belim alîkarî bi mezinbûnê ve û gelek faktorên din ku bandorê li mezinbûnê bikin û bi zehmetî tîrên pîvan, bi awayekî hevber girêdayî be.

Ev arîşe dikarin heta astekê werin piştguhkirin, heke aborînas bikarin guherbareke “navgînî” (x) ku alîkarî pê girêdayî ye bibînin, ku tenê bi bandora xwe ya li ser alîkariyê bandorê li mezinbûnê (heke hebe) dike û mihtemelen ji hemû diyarkerên din ên mezinbûnê serbixwe ne. Di vê rewşê de, mirov dikare bandora x li ser mezinbûnê bo pêşbînkirina bandora alîkariyê li ser mezinbûnê bi kar bîne. Teknîkên guherbar ên navgînî, azmûnkirina siyasetan, û pêbaweriya li hember “azmûnên xwezayî” pir berbelav bûne, lê belê ew bi xwe re der barê gelemperîkirina encamên azmûnî li ser nifûsa armanckirî arîşeyên nû tînin (Deaton 2010; Cartwright and Hardie 2013).

2.6 Binyad û stratejiya aborînasiyê: paradîgma û bernameyên lêkolînê

Di dema xebata Kuhn (1970) û Lakatos (1970) de, haya felsefevanan ji binyadên teorîk ên mezintir hebûn û bi wan re eleqedar jî dibûn, ku di nav kevneşopiyên lêkolînê yê taybet de hem lêkolîn dikirin yek û hem jî rêberiya lêkolînê dikirin. Çi ku di aborînasiyê de gelek proje an nêzikahîtdanên teorîk bi awayekî pergali yekkirî ne, ew pirsan dipirsin ka çi rêberiya lêkolînê dike, û gelek aborînasan xebata Kuhn an Lakatos di hewldanên ronîkirina binyada tam a aborînasiyê de sepandine (Baumberg 1977, Blaug 1976, de Marchi and Blaug 1991, Bronfenbrenner 1971, Coats 1969, Dillard 1978, Hands 1985b, Hausman 1992, beş: 6, Hutchison 1978, Latsis 1976, Jalladeau 1978, Kunin and Weaver 1971, Stanfield 1974, Weintraub 1985, Worland 1972). Serketina van sepandinan nîqaşbar e, lê belê berawirdkirina binyada aborînasiyê bi şemaya Kuhn û Lakatos xizmeta nîşandana taybetiyên vediyarker ên aborînasiyê kir, belim tevkarîya hin guherînên di aborînasiyê de kiribe. Bo nimûne, pîrskirina ka di aborînasiyê de “sehekiya pozîtîv” ji çi pêk hatiye, rê dide mirov da bibîne ku modelên teorîk ên sereke bi awayekî tîpîk hewl didin da nîşan bidin ku dê hevsengîyeke aboriyî çêbe, û her wiha modelên sereke ne tenê li ser faraziyên xwe yê hevbeş lê belê li ser gelek xalên din jî tîpîk cem hev. Çi ku di aborînasiyê de serketina projeyên lêkolînê nîqaşbar e, têgihîştina binyad û stratejiya wan a tam, alîkarî kiriye ku dezavantaj û avantajên wan werin zelalkirin.

3. Netemamîti, mercên *ceteris paribus*, meyldarî, “feraziye-yên nerastîbînkî” û model

Wekî ku di beşa berê de hate qalkirin, mijara girîngtirîn a metodolojîk a derbarê aborînasiyê de sadekirineke pir zêde, îdealîzekirin, û razberkirina ku teoriya aborînasiyê pênase dike û gumanên encamî yên derbarê ka aborînasî baş tê piştgirîkirin an na, ku ev taybetiyên aborînasiyê derdixin holê. Îdîayên wekî, “Ajan boxçikên tiştan ên mezin tercîha yên biçûk dikan,” pirsên cidî derdixin holê, lewra heke ew wekî gelemperîkirinên gerdûnî bîn şirovekirin, ew xelet in; û felsefeya zanistê bi awayekî kevneşopkî girîman dike ku zanist xwe bo kişfkirina zagonên heqîqî, ango gelemperîkirinên gerdûnî yên rastîn, nezir dike. Her çiqas xelet be jî ku her kes her tim boxçikên tiştan ên mezin tercîha yên biçûktir dike, gelemperîkirin, înfomatîv û kêrhatî xuya dike. Gelo zanistek dikare xwe bispêre gelemperîkirinên xelet? Eger ev îdîa ne gelemperîkirinên gerdûnî ne, hingî teşeya wan a mantiqî çi ye? Ê çawa dibe ku îdîayên ku bi vî awayî dixuyîn xelet bin, an jî nêzikî wê bin ku bîn ceribandî û eshîkirin an na? Van arîşeyan, ji hizirînên metodolojîk ên roja yekem heta roja îro serê aborînasan û metodolojîstên aborînasiyê êşandiye.

3.1 Aborînasiya klasîk û rêbaza pêşbîr

Li ser metodolojiya aborînasiyê fikirînên ewil ên berfireh di xebatên Nassau Senior (1836) û John Stuart Mill (1836) de xuya dikan. Divê nivîsên wan li dijî paşxaneyê hem teoriya aborînasiyê û hem jî felsefeya zanistê ya serdemên wan bê fehmkirin. Wekî aborînasiya Smith (ku bo pir tiştan deyndarê wî ne) û ya modern, aborînasiya “klasîk” ya dehsalên navîn ên sedsala 19an jî, birêzîkbûnên aboriyê bi hîlbijartinên takekesên ku bi zêfanên civakî û xwezayî rû bi rû ne ve girê dabûn. Lê belê, dema bi Smith re tê berawirdkirin, li hember modelên ku bi awayekî cidî hatine sadekirin pêbaweriyê zêdetir hebû. *Principles of Political Economy* a David Ricardo (1817), wêneyekê xêz dike ku tê de destheqên ji asta debara kêmtirîn dibe sedema zêdebûna nifûsê, ku bi xwe re pêwîstiya çandiniyê tîrtir an çandina qadên kêmbêr derdixe holê. Berfirehtirîkirina çandiniyê, dibe sedema qezencên kêmtir û kirêyên zêdetir, û tevahiya çîroka geşedana aboriyê dibe sedema rewşê westar a

reşbîn, ku tê de qezenc pir kêr in ku rê li ber veberhênanê safî vekin, destheq dadikevin asta debara kêmtirîn, û tenê xwediyên zeviyan dewlemend in.

Bo cîhanê wekî xweşbextiyekê, lê bo teorîsyenên aboriyî yên navenda sedsala 19an bedbextiyekê, dane, bi berdewamî li dijî meylên ku teoriyê pêş diditin xuya dikir (de Marchi 1970). Lê belê, teoriyê ji zêdetirî nîv sedsalî din derbasdariya xwe domand, û daneyên ku bi awayekî hevîrtî li dijî wê bûn bi hin “sedemên acizker” hatin ravekirin. Ji ber vê, ne ecêb e ku vegotinên Senior û Mill ên di derbarê rêbaza aborînasîyê de li ser xweseriya îzafî ya teoriyê radiwestin.

Mill, du cureyên sereke yên rêbazên îstîqraî ji hev vediqetîne. Rêbaza paşbîr (*a posteriori*), rêbazeke serpêhatiya rasterast e. Di nêrîna wî de, ew tenê bo diyardeyên ku tê de çend faktorên sedemî dişixulin an jî kontrolên azmûnî gengaz in. Rêbazên Mill ên navdar ên îstîqrayê, bo rêbaza *paşbîr* vegotinekê peyda dike. Bo nimûne, di rêbaza wî ya cudahiyê de, mirov ji bilî yekê hemû faktorên sedemî sabit digire û kontrol dike ku bibîne ka dema ku ew faktor tê derxistin bandor jî tê birrîn yan na. Armanç ew e ku zagonên sedemî yên bêistîna werin pênasêkirin.

Mill, doz dike ku rêbazên îstîqraî yên rasterast bo lêkolîna diyardeyên ku gelek faktorên sedemî tê de hene nayê bikaranîn. Bo nimûne, heke yek hewl bide ku bi rêya berawirdkirina kamiraniya neteweyên bi tarîfeyên bilind û yên bêyî tarîfeyên bilind bikole ka tarîfe kamiraniyê xurt dikin an asteng dikin, dê encam neinformatîv be, çiku kamiranî girêdayî gelek faktorên sedemî yên din e. Ji ber vê, Mill doz dike ku ji dêvla vê hewcedariya mirov bi bikaranîna rêbaza pêşbîr (*a priori*) heye. Tevî navê wê, ev jî rêbazeke îstîqraî ye. Lê belê, berevajî rêbaza *paşbîr*, rêbaza *pêşbîr* rêbazeke îstîqraî ya *nerasterast* e. Zanyar, di qadên ku rêbazên Mill yên îstîqrayê dikarin werin sepandin de, berî her tiştî zagonên ku faktorên sedemî yên takekesî bi rê ve dibin diyar dikin. Piştî ku zagonên sedemên takekesî tên diyarkirin, ew, encamên wan ên hevbeş bi awayekî talîlî dikolin. Di dawiyê de, bo “esehîkirina” encamên hevbeş rolek heye, lê ji ber tevliheviyên sedemî, ev ceribandî xwedî giraniyeke kêmtir e. Ceribandîna encaman, tenê bi du awayan xizmet dike: kontrola talîlên zanyar, û destnîşana hebûn an tunebûna sedemên acizker ên girîng, ku zanyar hîn nedane ber çavan.

Mill mînaka zanista kêş û vekêşê dide. Fîzîknasan bi lêkolîna tevgerên gerestêrkan zagona erdkêşiyê diyar kirine, ku tê de erdkêşî tekane faktorê sedemî ya girîng e. Fîzîknasan, pişt re teoriya kêş û vekêşê, ji wê zagonê û zanînên di derbarê helwest û tevgerên heyv û rojê de bi awayekî talîlî ava kirine. Îmayên teoriyê dê netemam bin û carinan jî pir xelet bin, çiku gelek faktorên sedemî yên temamker bandorê li kêş û vekêşê dikin. Ceribandina teoriyên kêş û vekêşê, dikare xeletiyên ku fîzîknasan di talîlan de çêkirine derxe holê, û belim delîlên derbarê rola faktorên temamker de jî derxe holê. Lê ji ber têkilheviya sedemî, ceribandinên bi vî rengî bo pesendkirin an pesendnekirina zagona erdkêşiyê tevkariyeke kêmtir dikare bike, ku jixwe hatiye sazkirin. Tevî ku Mill pir caran zimanê “*ceteris paribus*” bikarîne, nêrîna wî ya ku doz dike ku rêgez an “zagonên” aborînasiyê di nebûna “destwerdanan” an “sedemên acizker” de derbasdar in, vegotinekê peyda dike ka rêgezên aborînasiyê çawa dikarin bibin *ceteris paribus* ya rastîn (Hausman 1992, beş: 8, 12).

Çiku teoriya aborînasiyê tenê sedemên herî girîngtirîn vedihewîne û bi awayekî pêwîst sedemên biçûk paşguh dike, îdîayên wê, mîna îdîayên derbarê kêş û vekêşê, netemam in. Pêşbînên wê dê neteqez, û carinan jî ji teqeziyê pir dûr bin. Mill doz dike ku, dîsa jî, bi rêya lêkolîna zagonên ku faktorên bingehîn ên sedemî di qadên sadetir de û paşê di rewşên têkilhevtir de derxistina encamên van teoriya aborînasiyê dikare were pêşvebirin û pesendkirin. Bo nimûne, daneyên statîstîkî yên derbarê têkiliya navbera destheqa kêmtirîn û bêkariya xebatkarên ji rêzê de şêlû ne; û çiku destheqa kêmtirîn qet pir zêde nebûye, ti dane tune ye ku destnîşan bide ka di van rewşan de bêkarî dê çi be. Li aliyê din, tecrubeya rojane hînî aborînasan dike ku firma dikarin di nava pêvajoyên kêmtir zêde arasteyî kedê de hîlbijartinan bikin û destheqeke kêmtirîn a bilind dê pêvajoyên zêdetir arasteyî kedê bihatir bike. Li gorî ferzkirina ku firma hewl didin maliyetên xwe kêmtir bikin, aborînas xwedî egereke baş (lê ne teqez) in ku bawer bikin da destheqeke kêmtirîn a bilind dê bêkariyê zêdetir bike.

Mill, bi parastina nêrîneke aborînasiyê bi vî rengî netemam û bikaranîna rêbazeke pêşbîr, hiziriye ku ew dikare azmûnparêziya xwe û girêdayitiya xwe ya bi aborînasiya Ricardo re li hev bîne. Her çend di dawîya sedsala nozdehan de aborînasên ku bawer

dikirin teorî ji şert û mercên siyasî û dîrokî pir dûr e li hember nêrînên Mill ên li ser metodolojiya aborînasiyê derketibin jî (Roscher 1874, Schmoller 1888, 1898), nêrînên metodolojîk ên Mill seranserê sedsalekê raseriya teoriya aborînasiyê ya sereke kir (wekî mînak, Cairnes 1875). Dîtina Mill bi navê şoreşa nûklasîk a di aborînasiyê de ku di destpêka 1870yan di dest pê kiriye, xelas bû û di berhemên zanistî yên girîngtirîn ên metodolojîk ên der barê aboriya nûklasîk, wekî *The Scope and Method of Political Economy* a John Neville Keynes (1891) an *An Essay on the Nature and Significance of Economic Science* a Lionel Robbins (1932), de dikare bi awayekî aşkere bê dîtin. Hausman (1992) doz dike ku, kirdariya metodolojîk a heyî ji nêzik ve dişibe metodolojiya Mill, tevî ku tenê çend aborînas bi awayekî aşkere diparêzin.

Her çiqas ev awayê şirovekirina Mill û metodolojiya aborînasiyê hevgirtî be û li felsefeyê kevnepêr a azmûnparêz a zanistê ku hêza zagonnasiyê ya gelemperîkirinê di gerdûnîbûna wan de dibîne tê jî, ew bi rêya ku aborînas teoriyên xwe dibînin ne bawer e. Ji dîtina gelemperîkirinê mîna çavbirçîtiyê wekî zagonên gerdûnî ku di nav xwe de taybetiyên *ceteris paribus* ên veşartî dihewînin zêdetir, aborînas, bi piranî meyl dîkin ku van gelemperîkirinê wekî “meyldariyan” bibînin; meyldariyên ku bi destwerdanan werin têkbirin jî wînda nabin û divê bi awayekî cuda werin lêkolînkirin (Woodward 2003). Mill jî, bêyî ku bi axaftina xwe ya li ser azmûnparêziya xwe re li hev bîne, qala meyldariyan dike. Heke mirov gumanên metafîzîkî yên li ser meyldariyan û dijraştîyan bide aliyekî, bo dîtina teorîzekirina rêbaza herî xwezayî wekî lêpîrsîna dijraştî ya kombînasyonên meyldariyan e. Wekî nîqaşa li jêr a modelan pesend dike, nêrînên wiha, bi dilê aborînasan in û bo felsefevanên xwedî gumanên azmûnparêz tevlihev in.

Têgehîkirina lêpîrsîna aborînasiyê wekî lêkolîna model û meyldariyan, xuya dike ku, ji pêşniyaza çareseriyekê wêdetir, mercên arîşeyên ku ji hêla netemamiyê ve hatine derxistin diguherîne. Bi rastî, Julian Reiss, di gotareke bandorker a bi navê “The Explanation Paradox.” de arîşe ji nû ve kişî kiriye (2013), ku doz dike ku ev sê rapeyvan ne hevgirtî ne: (1) Modelên aborînasiyê xelet in. (2) Modelên aborînasiyê raveker in. (3) Ravekirin, rastiyê divê. Formulekirin, hinekî şêlû ye, çiku model ne

ew hevok an rapeyvên tekane ne ku dikarin rast an xelet bin. Lê belê divê aşkere be ku paradoksa ferzkirî ya Reiss, bo arîşeya ku ji ber netemamiya teorî an modelên aborînasiyê derdikeve holê formulekirineke ji nû ve ye.

3.2 Friedman û parastina “feraziyên nerastîbînkî”

Her çend hin felsefevanên hemdem doz kirine ku rêbaza Mill a *pêşbîr* bi piranî dikare were parastin (Bhaskar 1975, Cartwright 1989, and Hausman 1992) jî, ji nîvê sedsala bîstan pê de, nêrînên Mill, bo gelek aborînasan bi têgihîştina felsefeya zanistê ya hemdem ve hevaheng nehate xuyakirin. Bêyî ku metna Mill bi baldarî bixwînin, hêsan bû ku aborînas termînolojiya wî xelet fehm bikin û rêbaza wî ya *pêşbîr* li dijî azmûnparêziyê bihesibînin. Hinekên din, nêrîna Mill a doz dike ku rêgezên aborînasiyê yên bingeîn ên aborî divê bi awayekî azmûnî werin avakirin bi awayekî cidî hilgirtin dest û hin delîl peyda kirin ku li hember hin rêgezên bingeîn, nemaze nêrîna ku şîrket hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin, bi guman in (Hall and Hitch 1938, Lester 1946, 1947). Metodolojîstên wekî Terence Hutchison (1938), ku der barê geşedanên hemdem ên di felsefeya zanistê de xwedî agahiyên baş in, “teoriya safî” ya di aborînasiyê de wekî nezanistî pênase kirin.

Aborînasên ku ji aliyê felsefî ve dihizirin, bo guhertina nêrîna Mill a kevnare bi metodolojiyeke nûjentir ku dê piraniya kirdariya îroyîn bipeyitîne çend rê pêşniyaz kirin (nemaze bnr. Machlup 1955, 1960 and Koopmans 1957). Ji van hewldanan a herî bandorker, gotara Milton Friedman a sala 1953an a bi navê “The Methodology of Positive Economics.” bû. Ev gotar, ji hemû xebatên din ên li ser metodolojiyê gelekî zêdetir xwedî bandoreke mezin e.

Friedman, bi veqetandineke konvansiyonel a di navbera aborînasiyên pozîtîv û normatîv dest bi gotara xwe dike û têw dike ku nakokiyên siyasî bi gelemperî nakokiyên di derheqê encamên vebijarkan de ne û ji ber vê dikarin bi pêşketina di aborînasiya pozîtîv de werin çareserkin. Friedman berê xwe dide aborînasiya pozîtîv û (bêyî arguman) îdîa dike ku pêşbîna rast a di derbarê diyardeyên ku hîn nehatine çavdêrîkirin de, armanca dawîn a *hemû* zanistên pozîtîv e. Ew di derbarê zanistê de xwedî nêrîneke kirdarî ye û nîrxê zanistê di pêşbînên ku rêberiya siyasî

dike de dibîne.

Çiku zehmet e û pir caran negengaz e ku azmûn werin pêkbînî û çiku zehmet e ku diyardeyên bêkontrol ên aborînas çavdêrî dikin werin şirovekirin (sewa heman têkilheviya sedemî ya ku Mill aciz dike), zor e ku were darizandin ka teoriyeke diyar bo pêşbînan zemîneke baş e an na. Meyldarî, ne zagonên gerdûnî ne. Îdîayeke wekî “fîrma hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin”, di wateya ku ew ne gelemperîkirineke gerdûnî ya rast de, dê “nerastîbînkî” be. Her çend ne bi van terman be jî, Friedman li hember wê rexneyê derdikeve û doz dike ku meyldarî, jî zagonên gerdûnî zêdetir, tenê meyldarî ne. Heke rexneya wî li wir bisekine, dê aqilane be, lê belê dê ji arîşeyên têgihîştin û nirxandina îdîayên di derbarê meyldariyê de dûr bisekine.

Lê belê, Friedman encameke radîkaltir xêz dike. Di termînolojiya wî de, xeletiya aborînasên ku îdîayên wekî “fîrma hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin” rexne dikin, di hewla ceribandina teoriyan, ne bi teqeziya pêşbînî xwe lê, bi “rastîbînparêziya” “feraziyên” xwe de veşartî ye. Ew doz dike ku rastîbînparêziya feraziyên teoriyekê, ne têkildarî nirxa wê ya pêşbînî ye. Ne girîng e ka feraziyeya ku dibêje “fîrma hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin” rastbînkî ye an na. Divê teorî nemaze di çarçoveya teqeziya pêşbînî wan werin nirxandin. Tiştê girîng nemaze ew e ka teoriya firmayan pêşbînî rast û girîng dike yan na.

Wekî ku rexnegiran destnîşan kirine (û hema hemû şirovekar rexnegir bûne), Friedman gelek tiştên cuda wekî “feraziyên” teoriyekê qebûl kirine, û bi pênasekirina feraziyan wekî “nerastîbînkî” çend tiştên cuda qest kirine (Brunner 1969). Çiku Friedman rexneya xwe çerxa kesan dike, ku bi awayekî azmûnî lêpîrsîn dikin ka fîrma di rastiyê de jî hewl didin da qezencên xwe zêdetirîn bikin, divê ew “feraziyeyan” bi awayeki hilbigire ku gelemperîkirinên navendî yên aborînasiyî jî bihewîne, wekî “fîrma hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin,” û divê ew bi terma “nerastîbînkî”, di nav tiştên din de, “xelet” qest bike. Di doz kirina ku dibêje nirxandina teoriyan di çarçoveya rastîbînparêziya feraziyeyan de şaşıyek e, Friedman doz dike ku qet nebe nirxandina teoriyan bi lêpîrsîna ka gelemperîkirinên wan ên navendî rast in an xelet in şaşıyek e.

Xuya dike ku ev şirove dê nêrînên Friedman nehev girtî bike, çiku bi ceribandina ka firma hewl didin ku qezencên xwe zêdetirîn bikin an na, mirov kontrol dike ka pêşbînên teoriyê yê di derbarê reftarên firmayan de rast in an şaş in. “Feraziyeke” wekî “firma qezencên me zêdetirîn dikin” bixwe pêşbînek e. Lê belê gelemşeyeke din jî heye. Friedman bi her pêşbînên teoriyên aborînasiyê re eleqedar nabe. Di nêrîna Friedman de, “divê teorî bi hêza wê ya pêşbînkirinê tê darizandin, nemaze *bo çîna diyardeyan ku ew dixwaze rave bike*” (1953, r. 8 [xwarik lê hatine zêdekirin]). Aborînas, tenê bi hin tuwancên teoriyên aborînasiyê re eleqedar dibin. Pêşbînên din, wekî yê di derbarê encamên lêkolînên rapirsînên rêveberan, bi siyasetê re ne eleqedar in. Tiştê girîng ew e ka teoriyên aborînasiyê di pêşbînên diyardeyan ku aborînas pê re eleqedar dibin de serketî ne yan na. Bi vegotîneke din, Friedman bawer dike ku teoriyên aborînasiyê divê di çarçoveya pêşbînên wan ên li ser bihayên û mîqdaran ku li bazarên tîpîk pevguherîn de werin nirxandin. Di nêrîna wî de, tiştê girîng têrkeriya pêşbînî ya gelemper ne lê “serketina teng a pêşbînê” ye (Hausman 2008a).

Ango, Friedman destûr dide aborînasan da du tiştan paşguh bikin: encamên acizker ên vepirsînan, û rastiya ku mirov her tim boxçikên mezintir ên tiştan tercîha yê biçûktir nakin. Ne jî divê aborînas bi fikar bin bê ka meyldariyeke bi rengê tercîhkirina tiştê zêdetir li hember ên kêmtir heye an na. Ne divê ew xwe nerihet bikin ku hin modelên wan bi aşkereyî girîman dikin ku hemû ajan bihayên hemû tiştên di hemû bazarên de heyî û yê dê di pêşerojê de hebin dizanin. Tiştê girîng ew e ka pêşbînên di derbarê diyardeyan bazarê de rast in an na. Û çiku encamên nelirê yê bazarê dikare ji ber hin faktorên sedemî yê nekontrolkirî derkeve holê, li cihê ku pêkanîna ceribandinan zehmet e, derdikeve meydana ku qet nedivê aborînas bikevin fikara rûbirûbûna bi delîleke ku dikare teoriya bingehîn bi awayekî xurt pesend neke. Dibe ku modelên bihûrgilî werin pesendkirin an nepesendkirin, lê teoriya bingehîn ewle ye. Bi vî rengî, mirov dikare têbigihîje ka metodolojiya Friedman, her çiqas feraziyeyên wê eletewş an bêmentiqî xuya bikin jî, bo xizmeta ortodoksiyeke teorîk a hişk çawa hatiye bikaranîn. Ew teorî xuya dike ku nêrîna eklektîk û pragmatîk dipeyitîne, ew nêrîn ku doz dike divê aborînas her modela ku wekî “dişixule” xuya dike bikar bînin. Bo nîqaşên din ên li ser gotara Friedman ji Bear and Orr 1969, Boland 1979, Hammond 1992, Hirsch and de Marchi 1990, Mäki 1990a, Melitz

1963, Rotwein 1959 û Samuelson 1963 jî binêrin.

Di nav du dehsalên dawîn de di aborînasiyê de xebatên ceribandînê zêdetir dibin, û mihtemelen êdî li ser nêrînên Friedman ên metodolojîk hevramaniyekê nîne. Lê ew hîn jî gelek bandorker in, û hîn jî bo, li hember pirsên ecêb ên derbarê sadekirin, îdealîzekirin, û razberkirina di aborînasiyê de, ji bersivandinê zêdetir, wekî rêyekê jêdûrbûnê xizmetê dike.

3.3 Model

Sedsal berê aborînasan di çarçoveya “rêgez”, “zagon”, û “teoriyan” de behsa xebatên xwe dikirin. Ew ziman, bi temamî ji holê ranebûye: aborînas hîn jî behsa “teoriya lîstikê”, “teoriya hîlbijartina berxweran” an jî “zagona daxwazê” dikin. Lê belê, di roja îro de di aborînasiyê de amûr an jî teşeya hizrî a standard “model” e. Ekonometrînas, behsa model û binyadan dikin. Aborînas, pênasekirina aksiyoimên di derbarê hîlbijartina aqlî de, ne wekî radekirina teoriyeke hîlbijartina aqlî lê, wekî avakirina modeleke hîlbijartina aqlî bi awayekî hêsantir dikin. Piraniya şirovekarên bijartî yên ku modelan dinirxînin, modelan wekî cîhanên xeyalî dibînin, û doz dikin ku xebatên li ser wan alîkariya me dikin da em diyardeyên rastîn fehm bikin (Frigg, 2010). “Afirandina modelan ‘afirandina cîhanê ye.’ “ (Morgan 2012, r. 95, 405). Di nêrîna wan de, aborînas dikarin lêpîrsîn bikin ka faktorên sedemî di nebûna destwerdanan de bi çêkirina modelan -ango aboriyên xeyalî-, ku tê de destwerdan nînin, dê çawa bişixulin. Uskali Mäki israr dike ku “Model ceribandin in. Ceribandin model in.” (2005). Dani Rodrik (2015) doz dike ku aborînasî ji berhevokeke modelan, û çalakiya aborînasiyê jî bi hîlbijartin an şayesandina modelekê ji vê berhevokê pêk tê. Gelo li her derê hatine axaftina modelan tenê guhertineke di modaya termînolojîk de ye, an eleqeya li hember modelan (ku bo aborînasiyê bi tu awayî ne bêhempa ye) nîşaneyê guherîneke metodolojîk e? Model çi ne? Ev pirsan ji hêla Cartwright 1989, 1999, Godfrey Smith 2006, Grüne-Yanoff 2009, Hausman 1992, 2015a, Kuorikoski ve Lehtinen 2009, Mäki, ed. 1991, Mäki 2005, 2009a, 2009b, Morgan 2001, 2004, 2012, Morgan ve Morrison 1999, Rappaport 1998, Sugden 2000, 2009, Weisberg 2007, and Lehtinen, Kuorikoski ve Ylikoski 2012 ve hatine nîqaşkirin.

Nêrîna modelan a ku aborînas herî zêde pê re eleqedar dibin, ji aliyê felsefî ve arîşedar e, lewra ev aşkere ye ku xwe dispêre hebûna bûnewerên xeyalî yên ku aborînas dikarin taybetî û meylên wan ên sedemî bikolin. Di ceribandinan de, çî li laboratuwarê an jî di qadê de bê çekirin, azmûnker bi bikerên azmûnî re têkiliyê datîne, û encam dibe ku li dijî pêşbînên aborînas bibin. Brevajîya vê, di lêpîrsîna modelekê de, aborînas bi bûnewerên xeyalî re “têkiliyê datîne”, ku mirov dikare doz bike da ji xeynî fikrên xwe bixwe ne tiştêkî din in, û tuwancên mentiqî yên aksiyoimên ku modelê pênase dikin qet xeyalşikestî nabin. Ev nayê wê wateyê ku lêpîrsîna mentiqî ya modelan tu caran bi surprîzan encam nade. Mirov ji aliyê mentiqî ve ne gişzan e û kişfkirina tuwancên komeke aksiyoiman dibe ku karekî dijwar be. Lê belê ew, karekî ji ceribandina laboratuwarê an qadê cuda ye, û hebûnnasiya “cîhanên” ku tê îdîakirin aborînasan “afîrandiye” û paşê li ser xebitîne bi kûrahî têkilhev e. Tevî ku bi kirdariya aboriyî kêmtir pêbawer e, qebûlkirina modelan wekî lêkeran an pênaseya lêkeran ji hêla felsefî ve pir zêdetir fehmbare (Hausman 1992). Bo nimûne, dema ku aborînas modela firmayeke bi deraneke tenê û du ketanan xêz dikin, ew konseptê ku dikarin bo şayesandina firmayên rastîn bikarbînin pênase dikin.

4. Nêzikahîtdanên bandorker li metodolojiya aborînasiyî

Nîv sedsaliya borî bûye şahidê derhatina lîteratûreke mezin ku bo metodolojiya aborînasiyî hatiye nezirkirin. Ev lîteratûr, gelek nêzikahîtdanên metodolojîk lêkolîn dike û encamên xwe li gelek dibistan û şaxên aborînasiyê dispîne. Piraniya lîteratûrê, li teoriya bîngehîn a aborînasiya sereke -teoriya hevsengiyê ku wekî hîlbijartina takekesî ya aqlî ya zêfandî derdikeve holê- hûr dibe, lê belê girîngiya muezem a makroaborînasiyê di diyarkirina bertekên minasib li hember qeyrana mezin a ku di sala 2008an de dest pê kir, tevî rola bi awayekî lezgîn zêdetir dibe ya lêkolînên azmûnî û ceribandînî yên di karê rojane ya aborînasan de di lêpîrsînên metodolojîk de deng vedan (Backhouse 2010). Ji sala 1985an û vir ve, kovareke bi navê *Economics and Philosophy* heye ku nemaze bo felsefeya aborînasiyê hatiye nezirkirin, û ji sala 1994an û vir ve jî kovareke bi navê *Journal of Economic Methodology* heye. Ev beş,

dê ji nêzikahîtdanên metodolojîk ên du dehsalên dawî hin mînakên pêşkêş bike.

4.1 Nêzikahîtdanên Popperî

Felsefeya zanistê ya Karl Popper di nava aborînasan de, her wekî di nav zanyarên din de jî, bandorker bûye. Popper, tiştê ku bixwe wekî metodolojiya pûçger bi nav dike diparêze (1968, 1969). Zanyar, divê teoriyên ku “bi awayekî mentiqî pûçkirinbar” formule bikin - angê, bi hin raportên çavdêriyê yê gengaz re nehevîrtî. “Hemû qîjalk reş in” bi awayekî mentiqî pûçkirinbar e; ew, bi raporteke çavdêriyê ya derbarê qîjalkeke sor re nehevîrtî ye, (û dikare ji aliyê raporteke wiha ve were pûçkirin. (Îdiayên îhtimalî, bêguman di vê wateyê de ne pûçkirinbar in.) Popper di pûçkirinbariyê de, li ser wê bingehe ku îdiayên nepûçkirinbar ên ku ti çavdêriyan ji holê ranakin neînformatîv in, îsrar dike. Ew, di derheqê bendewariyan de ti rêberiyê nakin, û ti tişt nîne ku ji ceribandina wan were fêrkirin. Ya duyem, Popper doz dike ku zanyar divê teoriyan duçarê ceribandinên dijwar bikin û amade bin ku gava ji ceribandinan derbas nebin wan red bikin. Ya sêyem, divê zanyar teoriyan bi îhtimala baştirîn wekî feraziyeyên balkêş bihesibînin. Derbaskirina testekê teoriyekê pesend nake yan jî bo ku zanyar pê bawer bikin sedeman peyda nake. Ew tenê ji aliyekî ve domandina bikaranîna hîpotezê (çiku ew hêj nehatiye pûçkirin), û ji hêla din ve, nezîrkirina bo hewldanên zêde yê ku pûçkirina wê armanc dîkin (çiku wê xwe ji ceribandinê heta niha xelas kiriye) dipeyitîne. Popper, bo zanistên civakî rêbaza ku wekî “mentîqa rewşî” bi nav kiriye (ku di esase xwe de teoriya hîlbijartina aqlî ye) wekî rêbaza rast parastîye (1967, 1976). Xuya ye ku di navbera pûçkîrîngeriya Popper û parastîna wî ya mentîqa rewşî de tengijînên cidî hene, û nîqaşa wî ya mentîqa rewşî bi qasî pûçkîrîngeriya wî bandorker nebûye. Bo nîqaşa ka çawa mentîqa rewşî li aborînasîyê tê sepandin ji Hands (1985a) binêrin.

Di bin mercên pûçkîrîngeriya Popper, bo têngihîştina ka sadekirinên pirolekî çawa dikarin meşrû bibin an kirdariya aborîyî ya heyî çawa dikare pêbawer be hêviyeke pir kêr xuya dike. Teorî û modelên aborînasîyê hema hema nepûçkirinbar in, û heke wisa bûna, dê qebûla berfireh a derbarê nêrînên metodolojîk ên Friedman dabîn bikira da ew duçarê ceribandinên cidî nebûne. Dema model bi awayekî aşkere nikaribin

ceribandinan derbas bikin, ew pir kêmtir tîr qebûlnekirin. Li şûna qebûlnekirinê, aborînas, digihîjin wê encamê ku wan bo peywirê modela xelet hilbijartine, an jî sedemên acizker hebûne. Modelên aborînasiyê, yê baş nehatine ceribandin, bi piranî, ne tenê wekî feraziyeyan lê, zêdetir wekî rêberên baş-avakirî yê siyasî tîr qebûlnekirin. Rexnegirên aborînasiya nûklasîk ev rexneyan kirine (Eichner 1983), piraniya ên felsefeya Popper a felsefeya zanistê pejirandine, aborînasiya sereke red nekirine û li hember sepînerên wê rexneyên tund nekirine.

Mark Blaug (1992) û Terence Hutchison (1938, 1977, 1978, 2000), ku metodolojîstên navdartirîn ên Popperê ne, taybetiyên diyar ên aborînasiyê rexne dikin, û herdu jî ceribandînan zêdetir û helwesteke rexnegirtir girîngtir dixwazin. Bo nimûne, Blaug, bo redkirina ravekirina cudahiyan hilbijartinan bi rêya cudahiyan tercîhan pesna Gary Becker (1976) dide, lê çiku pê de neçûye û teoriyên xwe bi awayekî cidî test nekirine wê rexne dike (1980a, beş: 14). Lê belê, hem Blaug hem jî Hutchison tundrewparêziya nêrînên Popper kêmtir dibînin û dihezirin ku peyama wê tenê ji wê pêk tê ku divê zanyar rexnegir bibin û bi ceribandina teoriyên xwe re mijûl bibin. Li hember Rexneyên Blaug û Hutchison carinan jî wê çarçoveyê de hatine derketin, ku teoriyên aborînasiyê, ji ber mercên wan ên *ceteris paribus* û gelek feraziyeyên alîkar ên bo dariştina tuwancên ceribandinbar lazim in *nikarin* werin ceribandin (Caldwell 1984). Lê belê ev bersiv, wê israra Popper paşguh dike, ku dibêje sewa ku şaşiyên di pêşbînan de bi xeletiyên feraziyeyên duyemane yan “destwerdanan” ve neyê girê dan, hewcedariya ceribandinê bi biryarên metodolojîk heye. Bo nêrînên li ser felsefeya Popper û sepanbariya wan bo aborînasiyê, ji de Marchi (1988), Caldwell (1991), Boland (1982, 1989, 1992, 1997), û Boylan and O’Gorman (2007), Backhouse (2009) û Thomas (2017) binêrin.

Sepandina nêrînên Popper ên di derbarê pûçkirinê de, bi rastî dê hilweşîner bûya. Ne tenê aborînasiya nûklasîk, lê hemû teoriyên aborînasiyê yê girîng dê wekî nezanistî bihatana tawanbarkirin, û dê ti rê tune bûna ku teoriyên aborînasiyê ji hev bihatana veqetandin. Di xwendineke naîv a nêrînên Popper de arîşeyeke sereke ew e ku mirov nikare xwebixwe ji teoriyan tuwancên ceribandinbar darişîne. Bo dariştina tuwancên ceribandinbar, pêdiviya mirov bi feraziyeyên alîkar ên derbarê belavkirina

dibetiyê, amûrên pîvanê, bo guherbarên nepîvandî cihgir, tunebûna destwerdanan, û hwd. jî heye. Ev, wekî “Arîşeya Duhem-Quine” tê binavkirin (Duhem 1906, Quine 1953, Cross 1982). Ev arîşe, bi awayekî gelemper derdikevin, û Popper doz dike ku, bi biryareke metodolojîk ku neserketina tuwanceke ceribandinbar a talîlî wekî neserketina teoriyê qebûl dike dikare werin çareserikirin. Lê di aborînasiyê de feraziyeşên alîkar gumanbar in û tê zanîn ku di gelek rewşan de xelet in. Dayîna biryara metodolojîk a ku Popper hewce dibîne, ne maqûl e û dê bibe sedem ku mirov hemû teoriyên aborînasiyê red bike.

Imre Lakatos (1970), ku di piraniya kariyera xwe ya felsefî de şopînerê Popper bû, bo vê arîşeyê çareseriyêke Popperî a berfirehtir pêşniyaz dike. Lakatos israr dike ku ceribandin her tim berawirdî ye. Dema ku teorî rastî zehmetiyên azmûnî tên, wekî ku her tim dibe, yek hewl dide ku wan biguherîne. Divê guherînên ji aliyê zanistî ve qebûlbar (di termînolojiya Lakatos de “ji aliyê teorîk ve pêşveker”) her tim xwediyê hin tuwancên din ên veser bin; wekî din, ew bi temamî demkî (*ad hoc*) dibin. Heke hin pêşbînên nû tên pesendkirin, hingê guherîn “ji aliyê azmûnî ve pêşveker” e, û egerê heye ku mirov teoriya neguherandî red bike û teoriya nû bikar bîne, bêtî ku îhtimala biserneketina teoriyan a bi gelemperî bide ber çavan. Her çiqas pêşketin zehmet be jî, nêrînên Lakatos, bi qasî yê Popper xwedî heman tuwancên hilweşîner nînin. Xuya ye ku Lakatos arîşeya şêweya nirxandina teoriya aborînasiyê ya sereke bi wê dozkirinê ku dibêje tiştê girîng, ne serketin an neserketina azmûnî zêdetir, pêşveçûn an paşveçûna azmûnî ye. Ji ber vê jî bo metodolojîstên aborînasiyê Nêrînên Lakatos ji yê Popper dîlkêştir in.

Bi pêşvexistina têgeha Thomas Kuhn a “paradîgma” (1970) û hin tuwancên ji Popper, Lakatos di derbarê binyada gelemper a teoriyê ya tevahiya teşebusên teorîk de nêrînek jî pêşkêş kir, ku wekî “bernameyên lêkolînê yê zanistî” bi nav dike. Lakatos balê dikişîne ser ku, “kakilekî” rapeyvên bingeşên teorîk heye ku bernameyêke lêkolînê pênase dike û divê di nava bernameyê de neyê pirsîyarkirin. Wekî din, endamên bernameyêke lêkolînê, komeke hevpar a sehekan qebûl dikin, ku di vegotin û guherîna teoriyên diyar de rêberiya wan dike. Ev nêrîn jî, bo metodolojîstên aborînasiyê dîlkêş bûye, çiku di aborînasiyê de geşedana teoriyê gelek

hatiye zêfandin û çiku aborînasî di destpêkê de xuya dike ku xwediyê “kakilekî” ye. Rastiya ku aborînas dev ji postulatên teorîk ên bingeîn ku xelet xuya dikin bernadin, dibe ku bi qebûlkirina wan wekî parçeyekî “kakilê bernameya lêkolînê ya nûklasîkî” were ravekirin û peyitandin.

Lê belê nêrînên Lakatos vegotîneke têrker peyda nake ka aborînasî, tevî ku piştî xwe dide sadekirinên pirole, çawa dikare zanistêke pêbawer be. Çiku, ew gumanbar e ka geşedana teoriya aborînasiyê ya nûklasîkî pêşveçûneke azmûnî nimandiye kiriye an na. Bo nimûne, guherîna teoriya havîla “kardînal” bi teoriya havîla “ordînal” (bnr. li jêr Beşa 5.1) di salên 1930an de, ku bi gelemperî wekî gaveke mezin tê qebûlkirin, tenê guhertina teoriyekê bi yeka din dihevine, ku ne xwediyê ti naveroka azmûnî ya veser e. Ji xeynî vê, Lakatos, tevî girîngîdayîna sehekan wekî teoriya rêber a guherînê, dîsa jî girîngiyê dide ceribandînê. Bo Lakatos, zanist, li gorî aborînasiya sereke hîn zêdetir ji hêla azmûnî ve tê handankirin (Hands 1992). Ew jî gumanbar e ka gelo teşebusên lêkolînê yên di aborînasiyê de xwedî “kakilan” in an na (Hoover 1991, Hausman 1992, beş: 6). Bo hewldanên ku armanc dikin nêrînên Lakatos bo aborînasiyê bisepînin li Latsis (1976) û Weintraub (1985) binêrin. Wekî ku di Marchi û Blaug (1991) de aşkere ye, nivîskarên metodolojiya aborînasiyê, di salên dawî de baweriya xwe bi felsefeya Lakatos her ku diçe zêdetir winda dikin (Backhouse 2009).

Di felsefeya zanistê ya Popper de arîşeyeke duyem a mezin heye, ku bandorê li nêrînên Lakatos jî dike. Her du jî doz dikin ku tiştêkî wekî pesendkirina azmûnî tune (ji bo hin nirxandinên dereng, li Lakatos 1974 binêrin). Popper û Lakatos doz dikin ku delîl ti carî bo ku mirov bawer bike da îdîayên zanistî rast in egerê peyda nakin, û her du jî red dikin ku encamên ceribandinan dikare xwe bi daxuyaniyên di hewldanên kirdarî an di lêpîrsîna teorîk ve girêdanê bipeyitîne. Bo rapeyveke nepûçkirî li gorî yeka din delîleke baştir nîne. Li ser vê nêrînê, kesekî ku pîrsiyar dike ka bo hin rapeyvan delîlên têrker hene ku di lêkolînên teorîk de an jî bo armancên siyasetê xwe pê ve girêdanê bipeyitîne, bi girîmankirina hebûna delîleke ku piştgiriya hîpotezan dike, “xeletîyeke” metodolojîk dike. Nemaze ji bilî Watkins (1984), kêf felsefevanên di nav kevneşopiya Popperî de bi vê encama dijwar re

hevrû bûne.

4.2 Retorîka aborînasiyê

Yek ji bertekên tundrew ên li hemberî zehmetiyên peyitandina piştdayîna bi sadekirinên cidî, înkarkirina têrkeriya metodolojîk a aborînasiyê ye. Alexander Rosenberg (1992) doz dike ku aborînasiî dikare tenê pêşbînên gelemper ên neteqez bike, û nikare pêş ve biçe, çiku li dora derûnnasiya xelkî hatiye avakirin, ku teoriyeke wasat a reftarên mirov e û (bi saya nelêvegerbariya nosyonên biqest) nikare were çêtirkin. Teoriyên aborînasiyê yên têkilhev, ji teoriya azmûnî cihêtir, tenê dema bo matematîkê tên sepandin ji aliyê zanistî ve binirx dibin. Çiku aborînasiî, bi zanistên xwezayî re heman pêşveçûna hevgirtî nîşan nade, mirov nikare pêşniyaza Rosenberg a doz dike ku aborînasiî naboşke azmûnî ye paşguh bike. Lê belê, qebûlkirina nêrîna wî ya doz dike ku *ti* pêşveçûn bi ser nexistiye û destûr nade pêşbînên çendani zehmet e. Bo nimûne, aborînasiî hemdem, li gorî nîşê beriya xwe jî, di buhatêdana vebijarkên senedên pardariyê an sêwirandina mezadê de pir baştir in.

Bertekeke di heman tundrewiyê de lê ya dijber ya Deirdre McCloskey e, ku hebûna standardên metodolojîk ên nesade ku aborînasiî divê hevrû be înkare dike (1985, 1992, 1994, 1994, 2000, McCloskey and Ziliak 2003, Ziliak and McCloskey 2008). Bi nêrîna wê, bo nirxandina kirdarî û berhemên dîsîplînekê pîvanên têkildar û girîng tenê ew in ku ji aliyê sepîneran ve tînin qebûlkin. Ji bilî çend pîvanên gelemper ên wekî durustî û amadebûna guhdariya rexneyan, bo her gotûbêjê pîvanên peyitînbar tenê yên aîdê beşdaran e. Ji ber vê, aborînasiî dikarin rîyalîyên qure yên felsefevanan ku armanc dikin bêjara aborînasiyê darizînin paşguh bikin. Komeke aborînasiî rêzdar her çî wekî aborînasiya baş qebûl bikin, ew bi awayekî jixweber dibe aborînasiya baş.

Standardên felsefî yên serketina azmûnî tenê gotinên beredayî ne. Kesên ku bi têgihîştina karaktera aborînasiyê û bi tevkeriya pêşketina wê re eleqedar in, divê xwe ji metodolojiyê dûr bide û li şûna wê li ser “retorîka” aborînasiyê, ango amûra argumanê û qanîhkirinê ku di nav aborînasan de bi ser dikeve, bişixule.

Lêkolînên McCloskey ên li ser retorîka aborînasiyê binirx û bibandor in (1985, nemaze beş: 5-7, McCloskey and Ziliak 2003, Ziliak and McCloskey 2008), lê belê piraniya xebatên wê ên di salên 1980 û 1990î de, ne ji lêkolînên retorîka aborînasiyê lê, ji rexneyên felsefî yên metodolojiya aborînasiyê pêk tên. Rexneyên wê yên felsefî arîşedar in, çiku zehmet e ku mirov helwesta di paragrafa berê de hatiye xêzkirin biparêze û bi ihtimaleke mezin jî xwebixwe têk dibe. Parastin zehmet e, çiku standardên epîstemolojîk jixwe bandor li gotûbêja aborînasan kiriye. Standardên serketina pêşbîniyî ku rê li ber mirov vedike, li ser aborînasiyê bikeve gumanê, standardên ku gelek aborînasan jixwe qebûl kirine. Bo jêrevîna ji van gumanan yekane rê, xweteslîmkirina standardên ku ew derxistine holê ye. Lê belê helwesta McCloskey, binî her argumana rêgezî dikole, ku di standardan de guherînekê armanc dike. Bi ser de jî, wekî Rosenberg (1988) doz kiriye, xuya dike ku heke aborînas teslîmî standardên serketina pêşbîniyî bibin dê xwebixwe mehkûmê bêteleqedariyê bikin, çiku çêkirina biryarên siyasetê bi standardên wiha ve girêdayî ye.

McCloskey, di rastiye de, naxwaze pêşî li ihtimala wê bigire, ku aborînas di hin rewşên ku divê qanîh nebin de qanîh dibin û di hin ên ku divê qanîh bibin de jî nabin. Çiku ew bixwe jî rexne dike ku hin aborînas xwediyê adeteke xirab in ku nirxa statîstîkî û girîngiya aborînasiyê tevî hev dikin (1985, beş: 9, McCloskey and Ziliak 2003, Ziliak and McCloskey 2008). McCloskey, dema li ser tiştê ku di rastiye de qanîh bike lêkolînê dike bi adetî retorîkê bi awayekî şayesî, lê belê carinan jî dema li ser tiştê ku divê qanîh bike lêkolînê dike bi awayekî normatîv karakterîze dike (1985, beş: 2). Û heke retorîk lêkolîna wê ye ka tiştê *divê* bi awayekî aqlî qanîh bike çi ye, hingê ew metodolojî ye, ne vebijarka metodolojiyê ye. Pirsên li ser ka aborînasî zanistêke azmûnî ya serketî ye an na, nabe ku ji holê werin rakirin.

4.3 Di metodolojiya aborînasiyê de “rastîbînparêzî”

Metodolojîstên aborînasiyê bala xwe zêde nedane nîqaşên ku di nava felsefeya zanistê de di navbera rastîbînparêz û dij-rastîbînparêzan de hatine kirin (van Fraassen 1980, Boyd 1984, Psillos 1999, Niniuoto 2002, Chakravarty 2010, Dicken 2016), çiku teoriyên aborînasiyê pir kêrîcaran hebûna bûnwer an hebûnên neçavdêrbar

ferz dikan, ji bilî guhartoyên “neçavdêrbarên rojane”, wekî bawerî û arezûyan. Ji aliyê din ve, metodolojîstan, armancên aborînasiyê bi tundî nîqaş kirine, lê belê yên ku doz dikan ku armancên dawîn pêşbîniyî ne (wekî Milton Friedman), sewa eleqeya xwe ya bo siyasetê vê dikan, ne sewa ku hewl didin da ji xaçepirsên zanînnasiyî û watenasiyî ên di derbarê referansên neçavdêrbaran de dûr bisekinin an jî wan çareser bikin.

Dîsa jî, di warê metodolojiya aborînasiyî de du bernameyên girîng ên rastîbînparêz ên nû hene. A yekem, ku bi piranî ji hêla Uskali Mäki ve hatiye pêşxistin, bo kişfkirina cureyên rastîbînparêziyê yên di daxuyaniyên metodolojîk û teşebusên teorîk ên aborînasan de veşartî hatiye nezirkirin (bnr. Mäki 1990a, b, c, 2007, and Lehtinen, Kuorikoski and Ylikoski 2012). Ya duyem, ku ji hêla Tony Lawson û hevpişeyên wî ve tê pejirandin, bi piranî li Zanîngeha Cambridge, ji xebata Roy Bhaskar (1975) hatiye dariştin (bnr. Lawson 1997, 2015, Bhaskar *et al.* 1998, Fleetwood 1999, Brown and Fleetwood 2003, Ackroyd and Fleetwood 2004, Edwards, Mahoney, and Vincent 2014). Di nêrîna Lawson de, piraniya netêrkeriyên aborînasiya sereke (ku ew bixwe jî rexnegirê wê ye) dikare bi eleqeya kêma li hember hebûnnasiyê ve were girêdan. Di hewldana tesbîtkirina birêzîkbûnê li ser rûbarê diyardayan de, aborînasên sereke mehkûmê têkçûnê ne. Di rastiye de diyardeyên aborînasiyî di bin bandora gelek faktorên sedemî yên cuda de ne, û mirov dikare tenê zanîna zanistî ya di bin mekanîzma û meyldariyan de bi dest bixe, ku şixulîna wan dikare di têkiliyên çavdêrbar de bi awayekî binavber û nediyar were dîtin. Tevî ku Mäki (mîna Mill, Cartwright û Hausman) eleqeya Lawson û Bhaskar a bo mekanîzmayên sedemî yên binî parve dike, têkiliya bernameyên Mäki û Lawson pir kêma e. Ji entriya li ser rastîbînparêziya zanistî jî binêrin.

4.4 Metodolojiya aborînasiyî û lêkolînên civakî li ser zanistê

Aborînasî di seranserê dîroka xwe de bûye mijara lêkolînên civaknasiyî û her wiha yên metodolojîk. Gelek nîqaşên civaknasiyî yên li ser aborînasiyê, wekî rexneya Marx li ser aboriya siyasî ya klasîk, bi pênasekirina tewişandinên bîrdoziyî re û bi vî awayî bi rexnekirina aliyên diyar ên teorî û siyaseta aborînasiyê re mijûl

bûne. Çiku her bernameyeke siyasî, aborînasên ku şahidiyê bo fezîletên wê yên aborînasiyê bike dibîne, bo materyalên rexneyên bi vî rengî çavkaniyeke bêdawî heye. Bo nimûne, piştî ku di sala 2008an de pergala darayî ya navneteweyî ti nema bû hilweşe, aborînasên Amerîkî yên doza qenaetkeriyê dikirin piranî Komarparêz bûn, li aliyê din ên hewldanên bo zêdekirina daxwaza giştî diparastin bi piranî Demokrat bûn.

Bandora civaknasiya zanistê ya hemdem û lêkolînên civakî yên zanistê, li gel zehmetiyên ku metodolojîst di hewldanên bo watedarkirin û aqlîkirina rêvebirina aborînasiyê de rû bi rû dimînin, rê li ber hewldanên yekkirina aborînasiyê û civaknasiyê (Granovetter 1985, Swedberg 1990, 2007) û her wiha di nava ramana metodolojîk bixwe de veguherîneke civaknasiyê vekirîye. Metodolojîst û dîroknasên wekî D. Wade Hands (2001); Hands and Mirowski 1998), Philip Mirowski (1990, 2002, 2004, 2013) û E. Roy Weintraub (1991), li cihê ku nîşan bidin da delîlên baş hene ku piştgiriya pêşveçûnên di teoriya aborînasiyê de dike an jî ku ev pêşveçûnan xwediyê fezîletên din ên zanînê yên berfireh in, doz kirine ku ev guherînan varyeteke berfireh a faktorên ne-aqlî dide ber çavan; ji guherînên di finansekirina aborînasiya teorîk heta teahudên siyasî, rikeberiyên kesane, vebestane bo metaforan û eleqeya bo matematîkê.

Wekî din, piraniya van metodolojîst û dîroknasan doz kirine ku aborînasî ne tenê heybereke lêpîrsîna civakî ye, lê di heman demê de dikare bibe amûreke lêpîrsîna civakî yên li ser zanistê jî. Bi lêkolîna binyada teşwîqî ya dîsîplînên zanistî û hêzên bazarê yên veşartî û aşkere ku bandorê li lêkolînê dikin (helbet lêkolînên li ser aborînasiyê jî tê de), divê nivîsandina aborînasiya zanistê û her wiha aborînasiya aborînasiyê jî gengaz bibe (Hands 1995, Hull 1988, Leonard 2002, Mirowski and Sent 2002).

Heke heye, ne zelal e ka têkiliyeke çawa ya vê xebatê bi wan pîrsan re heye, ku lê dipîrsin ka îdîayên aborînasan çiqas baş têne piştgirîkirin. Her çend ji metodolojiya kevneşopî dûr disekine jî, monografiya Mirowski ya li ser rola analojiya fîzîkî di aborînasiyê de (1990), bi gelemperî li hember aborînasiya sereke pir rexnegir e. D. W. Hands di *Reflection without Rules* (2001) de diparêze ku rêzikên metodolojîk ên

gelemper kê mên bikaranîn. Ew, di derbarê metodolojiyê de nêrîneke xwezaparêz diparêze û li hember reçeteyên ku ne li gorî zanîna bi hûrgilî ne gumanbar e. Lê belê, ew doz jî nake ku ti rêzik ne derbasdar in.

4.5 Vekolînên bûyerî

Rapirsîna li jor a nêzikahîtdanên derbarê arîşeyên bingeîn ên nirxandina teoriya aborînasiyê ji temambûnê ve pir dûr e. Bo nimûne, bo sepandina nêrînên binyadger ên teoriyên zanistî (Sneed 1971, Stegmüller 1976, 1979) bo aborînasiyê (Stegmüller et al. 1981, Hamminga 1983, Hands 1985c, Balzer and Hamminga 1989) hewldanên girîng hene. Nîqaşa li jor, pirrengî û nelihevkerîna di derbarê şirovekirin û nirxandina teoriyên aborînasiyê de belge dike. Ne ecêb e ku di nav wan kesên li ser metodolojiya aborînasiyê ya nirxandina giştî ya azmûnî bo nêzikahîtdanên diyar ên aborînasiyê, tevî mîkroaborînasi, makroaborînasi û ekonometrînasiya sereke, lihevkerînek tune ye. Dema sepîner nikaribin li hev bikin, tê pirsîyarkirin ka kesên felsefeyê zêde lê aborînasiyê kê mên dizanin dikarin arîşeyê çareser bikin an na. Çi ku nîqaş berdewam dikin, divê rola kesên ku li ser metodolojiya aborînasiyê dihizirin jî bidome.

Di vê navberê de, gelek pirsên din ên metodolojîk hene ku dê bîr ravekerin, û ew nîşaneke kamilbûna bindîsîplînekê ye ku her rêjeyeke mezin û zêdebar a xebatên li ser metodolojiyê pirsên taybetir rave dikin. Li ser vê gelek xebat hene, hûrnêrîna ji hejmereke nû ya *Journal of Economic Methodology* an *Economics and Philosophy* dê pesend bike. Li jor di Beşa 2yan de hin mijarên ku niha li ser nîqaş didome hatine bilêvkerin. Li jêr jî gelek qadên ku eleqe li ser e, sê heb hatine rêzkerin:

1. Her çiqas bi piranî jî metodolojiyê zêdetir bi naveroka aborînasiyê ve mijûl bibe jî, peqîna dawî a di xebatên li ser aborînasiya femînîst, bi xwe-hizirîna metodolojîk û civaknasiyê tijî ye. Rastiya ku li gorî her zanista civakî û heta piraniya zanistên xwezayî rêjeyeke mezintir a aborînasan mên in, pirsan derdixe holê ka di derbarê vê dîsîplînê de tiştekî bi taybetî nêrza heye an na. Nivîsên girîng, wekî Ferber and Nelson (1993, 2003), Nelson (1995, 1996, 2001), Barker and Kuiper (2003) in. Ji 1995an û vir ve, kovareke bi navê *Feminist Economics* heye ku piraniya

vê xebatê tîne cem hev.

2. Di dehsalên dawî de, di qada aborînasiyê de ceribandinên laboratuwarê bi lezûbez zêde bûn. Gelek armancên cuda yên ceribandinên laboratuwarê hene (bnr. Roth 1988) û dixuye ku dikarin valahiya di navbera teoriya aborînasiyê ya bingeîn û delîlên azmûnî bigirin. Hin ji wan, dide ber çavan ka teahudên metodolojîk çawa bandorê li asta girîngîdayîna aborînasan a delîlên azmûnî dike. Di aborînasiya hemdem de piraniya ceribandinên laboratuwarê di xizmeta aborînasiya reftarî de ne, ku pesnê xwe bi girîngîdayîna delîlên azmûnî yên derbarê binyad û diyarkerên hîlbijartinên takekesî dide. Tevî ku aborînasiya reftarî di nav aborînasiya sereke de bo xwe palpişteki peyda kiriye, bi awayekî berbiçav û metodolojîk nîqaşbar maye, û tuwancên wê yên bo aborînasiya normatîv, wekî di Beşa 6an de hatiye qalkirin, nîqaşbar in.

Bo nimûne, di rewşa berevajîkirina tercîhan de, ku di Beşa 5.1 de bi kurtî hatiye nîqaşkirin, aborînasan girîngiyeke berbiçav dane encamên azmûnî û qebûl kirine ku wan encaman rêgezên navendî yên aborînasiyê pûç kirine. Lê aborînasan bi gelemperî nexwestine baleke cidî bidin teoriyên ji hêla derûnnasan ve hatine pêşniyazkirin, û beriya ku bîr çavdêrîkirin pêşbîniya diyardayan dîkin. Xuya ye sedema vê ew e ku ev teoriyên derûnnasiyê, ji rêgezên bingeîn ên aborînasiya sereke cihêtir, ne xwediyê wergireyeke berfireh e (Hausman 1992, beş: 13). Dudiliya derbarê noraborînasiyê de (Camerer *et al.* 2005, Camerer 2009, Marchionni and Vromen 2014, Rustichini 2005, 2009, Glimcher and Fehr 2013, Reuter and Montag 2016, Vromen and Marchionni 2018) jî hevpar e. Di gotareke pir bandorker a bi navê “The Case for Mindless Economics.” de Gul û Pesendorfer (2008) doz dîkin ku encamên aborînasiya reftarî (û noraborînasiyê) ne tîkildarî aborînasiyê ne. Ew herî zêde dikarin bibin nirxên sehekî. Ew îsrar dîkin ku encamên aborînasiya reftarî ne tîkildarî aborînasiyê ne, çûku ew bi hîlbijartinên bazarê û encamên wan re eleqedar nabin, ku tekane daneyên tîkildar in. Carinan tê dîtin ku Gul û Pesendorfer teoriya aborînasiyê bi encamên azmûnî yên ku aborînas pê re eleqedar in pênase dîkin, lê di hin xalên din de ew Milton Friedman teqlîd dîkin (bnr. beş: 3.2) û înkâr dîkin ku “rastîbînparêziya” “feraziyeyên” modelên aborînasiyê girîng e. Ew, ji Dietrich û List

(2016) cihêtir, di derbarê rewşên zêhnî de parastinên têkilhev ên rastîbînparêziyê nakin. Bi min wisa xuya dike ku berxwedana teorîk li hember hevbandoriya bi aborînasên reftarî re, ku di gotara Gul û Pesandorfer de tê dîtin, her ku diçe lawaztir dibe. Lê aşkere ye ku teahudên metodolojîk ên aborînasiya teorîk bi rê ve dibin, li gorî qaîdeyên gelemperî yên ji hêla felsefevanên wekî Popper û Lakatos ve hatine pêşniyaz kirin, têkilhevtir û taybettir in.

Girîngiya ceribandinên laboratuwarê nîqaşbar dimînin. Aborînasên reftarî dilxwaz in, ji aliyê in teorîsyenên zêdetir kevneşop pirsîyariyê dikin ka encamên azmûnî dikarin bo deqbandên ne-ceribandinî bîn gelemperkirin û, bi gelemperî, ihtimalên fêrbûna ji azmûnan (Caplin and Schotter 2008). Bo nîqaşên aborînasiya azmûnî ji Guala (2000a, b, 2005), Hey (1991), Kagel and Roth (1995, 2016), Plott (1991), Smith (1991), Starmer (1999), Camerer (2003), Bardsley and Cubitt 2009, Durlauf and Blume (2009), Branas-Garza and Cabrales (2015), Fréchette and Schotter (2015), Jacquemet and L'Haridon (2018), û hejmara taybet a *Journal of Economic Methodology* ya Hezîrana 2005an binêrin. Teoriya Lîstîkê ya Al Roth, Aborînasiya Azmûnî û Rûpela Sêwirana Bazarê (<http://kuznets.fas.harvard.edu/~aroth/alroth.html>) çavkaniyeke kêrhatî ye. Bo xebatên dawî yên li ser aborînasiya reftarî ji *Journal of Behavioral Economics*, *Review of Behavioral Economics*, û *Behavioral Public Policy* binêrin.

3. Di dema nîfşê borî de, di helwestên aborînasan a li hember lêpîrsîna azmûnî ya sedemî de, nemaze di teşeya azmûnên qadê û azmûnên xwezayî de, ku gelek caran bi bikaranîna guherbarên navgînî bi kar tînin, veguherîneke giran qewimî. Bo nimûne, ji sisêyan du gotarên di hejmara Sibata 2018an a *American Economic Review* li ser lêkolînên azmûnî hatine avakirin. Di tabloya naverokê de sernavên çar entriyên pêşîn ev in: “The Effects of Pretrial Detention on Conviction, Future Crime, and Employment: Evidence from Randomly Assigned Judges” (“Bandorên Binçavkirina Beriya Darizandinê li ser Mehkûmîyetê, Sûcê Dahatûyê û Îstihdamê: Delîlên ji Dadgerên ku bi Awayekî Rasthatî Hatine Tayînkirin”), “Implications of US Tax Policy for House Prices, Rents, and Homeownership” (“Tuwançên Siyaseta Bacê ya Dewletên Yekbûyî yên bo Bihayên Xanî, Kirê, û Xwedanmaliyê”), “The

Welfare Cost of Perceived Policy Uncertainty: Evidence from Social Security” (“Maliyeta Nedyariya Sehkirî ya Siyasetê li ser Kamiraniyê: Delîlên ji Ewlehiya Civakî”), “The Economic Consequences of Hospital Admissions” (“Encamên Aborî yên Qebûlkirina Nexweşxaneyan”). Heke yek bîst û pênc salan şûnde here, tenê nêzikî ji heştan yek a hejmara yekem a *American Economic Review* a di 1993an de li ser lêkolîneke azmûnî hatibûn avakirin. Çar entriyên pêşîn ev in: “Today’s Task for Economists” (“Bo Aborînasan Peywira Îro”), “Trigger Points and Budget Cuts: Explaining the Effects of Fiscal Austerity,” (“Xalên Tetikê û Qutkirinên Budçeyê: Şirovekirina Bandorên Tengasiya Darayî”), “Economic Policy, Economic Performance, and Elections” (“Siyaseta Aboriyê, Performansa Aboriyê û Hilbijartin”), “The Macroeconomics of Dr. Strangelove” (“Makroaborînasiya Dr. Strangelove”). Rip Van Winkle ê di sala 1983an de bi xwendina rojnameyên aborînasiyê yên sereke dikete xewê, heke di 2018an de hişyar bûbûya dê ecêb bima.

Di aborînasiya pêşketinê de azmûnên qadê nemaze di hin deman de girîngtir bûne; demên ku encamên projeyên têvel ên alîkariya derveyî bi piranî fêdeyên lawaz peyda dikirin. Bo vî karî mirov dikare di van xebatan de destpêkên baş bibîne: Carpenter *et al.* (2005), Duflo and Banerjee (2011, 2017), Gugerty and Karlan (2018), Karlan and Appel (2011, 2016), Kremer and Glennerster (2011), List and Samek (2018), û Mullainathan and Shafir (2013). Ji Poverty Action Lab jî binêrin. Her çend azmûnên qadê bo diyarkirina tiştên dişixulin û naşixulin lêpîrsînên dijwar dixuyîn jî, mijar ne ew qas hêsan e (Deaton 2010, Cartwright and Hardie 2013). Bêyî agahiya mekanîzmayan, pir hêsan e ku destwerdaneke ku li cih û demekê bi awayekî tekûz dişixule, dema li cihekî din tê ceribandin bi awayekî giran têk biçe. Lêpîrsîna ateorîk, dema ku ji hêla metodolojîk ve têkilhev e jî, wekî taktîkeke bidestxistina zanînê xwediyê sînorên giran e.

Di aborînasiyê de guherîna azmûnî, bandor li zêdetirbûna girîngiya dîroka aboriyê jî kiriye. Nemaze di pênasekirina guherbarên navgînî ên mihtemel de bi hin afirîneriyê dîrok bi “azmûnên xwezayî” tijî ye. Bo nimûne (J. Hausman 2016), Kongreya Amerîkî di 1936an de deng da ku mûçeyên malnîşîniyê yên xaziyên Şerê Cîhanê yê Yekem 8 salan zûtir werin dayîn. Çiku rêjeya xaziyan li her eyaletî cudatir

bû, Hausman dikare performansên aborî yên eyaletan ên têvel bo texmînkirina bandorên teşwîqa aboriyî ku bi dayîna mûçeyên derketiye holê bi kar bîne. Tevî ku li gorî ceribandinên kontrolkirî yên rasthatinî (ku pirî caran ne pêkan e ku werin kirin) kêmtir teqez e jî, lêkolîna beşên dîrokî yên wekî vê, di derbarê hîpotezên aborînasiyî de delîlên girîng pêşkêş dikin.

5. Teoriya hîlbijartina aqlî

Divê aborînasî, bi qasî ku diyardeyan wekî hîlbijartinên takekesî rave û pêşbînî dike, ajanan jî heta astekê wekî aqlî nîşan bide. Aqlîtî, mîna muhakemeyan, nîrxandinê vedihewîne, û wek çawa em dikarin aqlîtiya hîlbijartinên takekesî binirxînin, em dikarin aqlîtiya hîlbijartinên civakî jî binirxînin, û pirsîyar bikin ka ew bi tercîh û darazên takekesan ve bi çi awayî têkildar in û divê di nav têkildariyeke çawa de bin. Wekî din, pirsên girîft ên derbarê aqlîtiya di rewşên stratejîk de hene, ku encam girêdayî hîlbijartinên pir takekesan e. Çiku aqlîtî di nav şaxên felsefeyê yên wekî teoriya çalakiyê, zanînnasî, sincnasî û felsefeya zêhn de têgeheke navendî ye, lêkolînên aqlîtiyê, pirî caran sînorê di navbera aborînasî û felsefeyê de derbas dikin.

5.1 Aqlîtiya takekesî

Teoriya sade ya aqlîtiyê ku li jor di Beşa 1.1 de hatiye nîqaşkirin, têw dike ku heke tercîhên ajaneke (rêzkirina karan) tam û gerguhêz bin dê aqlî bin, û heke ajan li cihê yê ku jixwe tercîh kiriye ti vebijarkên çêbûnbar tercîh neke dê hîlbijartina wî/wê aqlî be. Aşkere ye ku teoriyeke aqlîtiyê ya bi vî rengî pir qels e. Lewra di van du rewşan de li ser îmaya aqlîtiyê tiştêkî nabêje: di derbarê baweriyê de, û di bin rewşa ku ajan her tişt ên têkildarî hîlbijartinên wan (bi teqezî) nizanin. Lê ew dibe ku pir xurt be jî, çiku, wekî Isaac Levi bi taybetî (1986) doz kiriye, di rewşên ku neteqeziyê vedihewînin de, ti neaqlîtî di xwedîbûna tercîhên netemam de tune ye. Carinan, rawestandîna darazê û redkirina rêzkirina vebijarkên ku baş nehatine fehmkirin, aqlî ye. Ji aliyê din, gerguhêzî rewşeke maqûl e, û argumana bi navê “pompeya diravan” nîşan dide ku heke tercîhên mirovekî negerguhêz bin û dil dike ku pevguherînan

bike, hingî ew mirov dikare were îstismarkirin. Bifikirin ku ajan A , X tercîha Y , Y tercîha Z û Z tercîha X dike, û ew A dê bo pevguherîna Y bo X , Z bo Y û X bo Z bi qasî $\$P$ pere bide. Ew tê wê wateyê ku, A , ku di destpêkê de xwediye Z ye, dê pêşî bo Y , paşê bo X û paşê jî bo Z bi qasî $\$P$ pere bide, û dê ev bidome. Ajan, ne bûdela ne. Ew dê li cihê vê pevguherînê an danûstendinê red bikin an jî bo ku negerguhêziyê jî holê rakin dê tercîhên xwe biguherînin (lê, ji Schick 1986 binêrin).

Ji aliyê din ve, delîlên berbiçav ên azmûnî hene ku nîşan didin ku tercîhên mirovan di rastiye de ne gerguhêz in. Delîlên bi vî rengî destnîşan nadin ku gerguhêzî ne pêdiviyeke aqlîtiyê ye. Li cihê wê, dibe ku destnîşan bide ku mirov carinan neaqlî ne. Bo nimûne, di rewşa bi navê “bervajîkirina tercîhan” de, maqûl xuya dike ku mirov di rastiye de hîlbijartinên neaqlî dikin (Lichtenstein and Slovic 1971, Tversky û Thaler 1990). Delîlên bînpêkirinê berdewam ên li hember gerguhêziyê sedema fikarê ye, çiku divê standardên aqlîtiyê ne di asta nepêkaniyê de bin.

Di teoriya sade ya aqlîtiyê de zehmetiyeke din derbarê takekesîkirina heyberên tercîhê yan jî hîlbijartinê derdikeve. Wekî mînak, daneyên ji lîstikên ultimatumê yê pir-qonaxî tîn bifikirin. Ferz bikin ku A dikare di navbera A û B de her yek ji dabeşkirinên 10 dolaran teklîf bike. B dikare teklîfa A qebûl an red bike. Heke B teklîfê red bike, hingê mîqdara diravan dadikeve 5 dolaran, û B dabeşkirina 5 dolaran teklîf dike ku A dikare qebûl an red bike. Heke A teklîfa B red bike, wê demê her du lîstikvan ti diravan wernagirin. Ferz bikin ku A teklîf dike ku 10 dolaran wekî 7 dolar bo A û 3 dolar jî bo B dabeş bike. B vê teklîfê red dike û teklîf dike ku 5 dolaran wekhev dabeş bikin, ango bo her yekî 2.5 dolar. Bi rastî jî, reftarên bi vî rengî berbelav in (Ochs and Roth 1989, s. 362). Bi ferzîkirina ku B diravên zêdetir tercîha yê kêmîr dike, ev hîlbijartinan wekî bînpêkirina gerguhêziyê xuya dikin. B 3 dolaran tercîha 2.50 dolaran dike, lê dîsa jî bo 2.50 dolaran 3 dolarên teqez red dike (bi îhtimaleke piçûk ku A red bike û B ti diravan wernegire). Lê belê heyberên hîlbijartinê ne tenê mîqdarên diravan e. B , 3 dolarên parçeyekî “peymanekê xav”, bo 2.50 dolarên parçeyekî verastkirineke adil red dike. Heke heyberên hîlbijartinê bi vî awayî werin pênasekirin, ti tîkçûnên gerguhêziyê nînin.

Ev çavdêriya maqûl, rê li ber arîşeyeke cidî vedike. Heta li ser awayê

takekesîkirina heyberên hilbijartinê zêfan tune bin, şert û mercên aqlîtiyê yên wekî gerguhêziyê vala ne. Hilbijartina A ya X li hember Y, Y li hember Z û Z li hember X gerguhêziyê bînpê nake, heke “dema vebijark Y be, X” û “dema vebijark Z be, X” ne heman heyberê hilbijartinê bin. John Broome (1991) doz dike ku hin rêgezên din ên berbiçav ên aqlîtiyê hewce ye ku awayê takekesîkirina vebijarkan sînordar bikin an jî ajanan bixwazin ku di navbera vebijarkên wekî “dema vebijark Y be, X” û “dema vebijark Z be, X” bêalî bimînin.

Bo şamilkirina teoriya aqlîtiyê bo rewşên ku xetereyê (ku heyberên hilbijartinê, piyangoyên bi îhtimalên aşîkar in) û neteqeziyê (ku ajan îhtimalan, heta hemû encamên mihtemel ên hilbijartinên xwe jî, nizanin) vedihewîne, pêdivî bi rêgezên zêdetir ên aqlîtiyê û bi sadekirinên teknîkî yên nîqaşbar heye. Alîgirên Bayes ên bikerî, ferz dikin ku takekesên di bin mercên neteqeziyê de, li hember hemû encaman, xwediya dibetiyên bikerî (dereceyên baweriyê) ne, ku baş hatine pênasekirin, û ji ber vê jî heyberên hilbijartinê dikarin wekî piyangoyan bînin modelkirin. Ev yek, her wekî di bin mercên ku xetereyê vedihewînin de jî derbasdar e, lê belê li cihê dibetiyên heyberî bi dibetiyên bikerî. Ji entriyên li ser teorema Bayes û zanînnasiya Bayesî binêrin. Aksioma girîngtirîn ku di nav şert û mercên xetere û neteqeziyê de pêdiviya teoriya hilbijartina aqlî pê heye serxwebûna mercî ye. Ew bi gelemperî dibêje ku tercîhên ajanê aqlî yên di navbera du piyangoyan ku encameke tenê cuda ye, divê bi tercîhên wan ên di navbera encamên cuda de li hev werin. Her çend di destpêkê de maqûl be jî, serxwebûna mercî gelek nîqaşbar e. Ji Allais and Hagen (1979) û McClennen (1983, 1990) binêrin.

Beşeke girîng a teoriya hilbijartina aqlî bi fermîkirina mercên aqlîtiyê û lêpîrsîna tuwancên wan re mijûl dibe. Dema tercîhên ajankî temam û gerguhêz û mercê domdariyeke zêdetir tîne cih, hingî ew dikarin bi fonksiyoneke bi navê havîla ordînal bînin temsîlkirin. Maneya vê ew e ku fonksiyoneke ku tercîhên ajankî temsîl dike dikare wiha bê pênasekirin: heke û tenê heke ajan X tercîha Y dike $U(X) > U(Y)$ dibe û heke û tenê heke ajan di navbera X û Y de bêalî ye $U(X) = U(Y)$ dibe. Ev fonksiyon tenê rêzîkirina tercîhan temsîl dike. Ew, ji rêzîkirinê wêdetir tu agahiyan venahewîne. Her veguherîna ku rêza “ U ” mihafeze dike, dê tercîhên ajan jî bi heman awayî temsîl

bike.

Dema ku tercîhên ajanekî, serxwebûna mercî û hin mercên din ên teknîkî jî bîne cih, hingê ew dikarin ji hêla fonksiyoneke havila payî werin temsîlkirin (Harsanyi 1977b, beş: 4, Hearnstein and Milnor 1953, Ramsey 1926, and Savage 1972). Fonksiyoneke bi vî rengî xwedî du taybetiyên girîng e. A yekem, havila payî ya piyangoyekê wekhevê yekûna xelatên wê ne, ku li gorî dibetiya wan hatine hesabkirin. A duyem, fonksiyonên havila payî heta veguherîneke pozîtîv a afîn bêhempa ne. Ev tê wê wateyê ku heke U û V her du jî fonksiyonên payî yên havilê ne ku tercîhên ajanekî temsîl dikin, naxwe bo hemû heyberên tercîhê, X , $V(X)$ divê wekhevê $aU(X) + b$ be, ku a û b hejmarên rastîn in û a pozîtîv e. Bi ser de, aksiomên aqlîtiyê îma dikin ku dereceyên baweriyê yên ajanekî dê aksiomên hesabê dibetiyê tetmîn bikin.

Derdora teoriya aqlîtiyê jî hêla gelek nîqaşan ve hatiye dorpêçkirin û li ser teoriyên aqlîtiyê yên lawaz an jî sererastkirî gelek lêpîrsînên fermî hene. Bo nîqaşa zêdetir, ji Allais û Hagen 1979, Barberà, Hammond and Seidl 1999, Kahneman and Tversky 1979, Loomes and Sugden 1982, Luce and Raiffa 1957, Machina 1987 û Gilboa and Schmeidler 2001 binêrin.

5.2 Aqlîtiya pevrayî û hîlbijartina civakî

Her çiqas civak jî takekesan pir cuda bin jî, mekanîzmayên wan hene ku vebijarkan binirxînin û hîlbijartinan bikin, û nirxandin û hîlbijartinên wan dibe ku aqlî an neaqlî bin. Lê belê, ne aşkere ye, ka kîjan rêgezên aqlîtiyê divê hîlbijartin û nirxandinên civakê bi rê ve bibin. Gerguhêzî, merceke maqûl e. Wisa dixuye ku civakeke dema bi vebijarkên X an Y ve rû bi rû dibe X , dema bi vebijarkên Y an Z ve rû bi rû dibe Y û dema bi vebijarkên X an Z ve rû bi rû dibe Z hildibijêre, yan fikra xwe guheriye yan jî bi awayekî neaqlî hildibijêre. Lê belê, neaqlîtiyên tîndîrîst ên bi vî rengî dikarin bi hêsanî ji mekanîzmayên standard derkevin, û armanc dikin ku hîlbijartinên civakî û tercîhên takekesî bi hev ve girê din. Ferz bikin ku di civakê de sê takekes hene. Takekes 1 vebijarkan wekî X , Y , Z rêz dike. Takekes 2 wan wekî Y , Z , X rêz dike. Takekes 3 wan wekî Z , X , Y rêz dike. Heke biryar li gorî encama

dengdana cotecot were dayîn, dê X ji aliyê cotê (X, Y), Y ji aliyê cotê (Y, Z) û Z ji aliyê cotê (X, Z) were hîlbijartin. Aşkere ye ku ev rewş acizker e, lê gelo di hîlbijartinên civakî de çerxên muhtemel neaqlî ne?

Arîşeyên hevrenge, bandorê li tiştê ku mirov dikare wekî hevgiriya mentiqî ya darazên civakî bi nav bike jî dike (List and Pettit 2002). Ferz bikin ku civak ji sê takekesên ku li ser rastî û xeletiya rapeyvên P û Q darazên li jêr dikin pêk tê, û daraza civakî jî piraniyê dişopîne.

	P	heke P paşê Q	Q
Takekes 1	rast	rast	rast
Takekes 2	xelet	rast	xelet
Takekes 3	rast	xelet	xelet
Civak	rast	rast	xelet

Darazên her yek ji takekesan, bi rêgezên mentiqê ve hevgirtî ne, lê darazên civakî wan bînpê dikin. Çi qas girîng e ku darazên civakî bi rêgezên mentiqê re hevgirtî bin?

Tevî ku teoriya hîlbijartina civakî bi vî awayî bi pirsên aqlîtiya civakî re mijûl dibe, piraniya xebata di teoriya hîlbijartina civakî de encamên yekkirina rêgezên aqlîtiyê û zêfanên bi aşkareyî *sincnasiyî* vedikole. Tevkariya pir girîng, teorema nepêkaniyê ya Kenneth Arrow e (1963, 1967). Arrow têw dike ku hem tercîhên takekesî û hem jî tercîhên civakî temam û gerguhêz in, û rêbaza teşekirina tercîhên civakî (yan jî çêkirina hîlbijartinên civakî), bo her yek ji profilên gengaz ên tercîhên takekesî di hin rêzkerinên tercîhên civakî de yan jî hîlbijartinên civakî de pîrsgirêkan derdixe. Bi ser de, Arrow rewşeke hevramaniyê yê lawaz ferz dike: Heke her kes X tercîha Y bike, naxwe divê Y ji aliyê civakê ve neyê tercîhkirin. A sêyem, ew ferz dike ku dîktatorek tune be, ku tercîhên wî, ji bilî tercîhên her ji kesekî din, tercîh an jî hîlbijartinên civakî diyar dike. A dawîn, wê şertê ferz dike ku tercîha civakî ya navbera X û Y , divê tenê girêdayî awayê rêzkerina takekesan a X û Y be, ne tiştêkî din. Arrow, pişt re encameke sosret îsbat dike, ku ti jî rêbazên têkildarî tercîhên civakî û takekesî nikare van hemû şert û mercan bi cih bîne!

Di şêst salên ku ji ser nivîsîna Arrow re derbas bûne, di teoriya hîlbijartina civakî

de gelek xebat hatine kirin, ku bi piranî bo sincnasiyê dibe ku xwediyê girîngiyeke mezin bin. Bo nimûne, John Harsanyi îsbat kiriye ku heke hem tercîhên takekesî û hem jî nirxandinên civakî aksiyomên teoriya havila payî (bi dibetiyên hevbeş an bêal) bînin cih û tercîhên civakî bi tercîhên takekesî yê hevramanî ve li hev werin, wê demê dê nirxandinên civakî ji hêla yekûneke giranîlêkirî a havilên takekesî bîn diyarkirin (1955, 1977a). Matthew Adler (2012) nêzikahîtdaneke mîna Harsanyi bi pêş de biriye da nîşan bide ku teşeyê havilparêziyê giranîlêkirî ya ku berjewendiyên kesên halxirabtir dide pêş, bi awayekî bêhempa listeyê dirêjtir a zêfanên aqlî û sincasiyê tîne cih. Dema di erkdanên dibetiyên de lihevnekirin hebe, encameke nepêkaniyê derdikeve holê: şertê hevramaniyê, tê wê wateyê ku, nirxandinên civakî dê bo hin profilên tercîhên takekesî aksiyomên teoriya havila payî nînin cih (Hammond 1983, Seidenfeld, *et al.* 1989, Mongin 1995). Bo nîqaşên zêdetir ên li ser teoriya hîlbijartina civakî û têkildariya teoriya havilê bi nirxandina civakî re, ji entriya li ser teoriya hîlbijartina civakî, Sen (1970) û bo ji nû ve nirxandinên dawîn Fleurbaey (2007) û Adler (2012) binêrin.

5.3 Teoriya lîstikê

Dema encam girêdayî kirinê çend ajanan be, hîlbijartina baştirîn a ajankê, dibe ku girêdayî hîlbijartinê ajankê din be. Her çiqas rêgezên aqlîtiyê ku hîlbijartina takekesî bi rê ve dive dibin hêj derbasdar bin jî, dibe ku hin rêgezên din ên aqlîtiyê hebin ku bendewariyên çalakiyên kesên din bi rê ve dibin (û bendewariyên wan ên di derbarê çalakî û bendewariyên we de, û hwd). Teoriya lîstikê, di nav aborînasiyê de xwedî rolekê ye ku her ku diçe girîngtir dibe, û her wiha hem bi lêpirsînê li ser aqlîtiyê û hem jî yê li ser sincnasiyê re eleqedar e. Bo nîqaşên zêdetir, ji entriyên li ser teoriya lîstikê, teoriya lîstikê û sincnasî, û teoriya lîstikê ya peresanî binêrin.

6. Aborînasî û sincnasî

Wekî ku di Beşa 2.1 de hatiye nîqaşkirin, piraniya aborînasan, aborînasiya pozîtîv û ya normatîv ji hev vediqetînin, û piraniya wan doz dikan ku aborînasî bi siyasetê ve

eleqedar dibe, di esasê de bo agahiya (erênî) ku di derbarê encamên siyasetê de peyda dike. Lê belê heman aborînas, şîretên xwe yên di derdarê çawaniya sererastkirina aboriyê de jî pêşkêş dikin, û qadeke bi navê aborînasiya normatîv jî heye.

Encam, sazî û pêvajoyên aborînasiyê, bi çend awayên cuda dikarin baştir an jî xerabtir bibin. Hin encam dikarin mirovan baştir bikin. Hin encamên din dikarin kêmtir newekhev bin. Hinekên din, dikarin azadiya takekesî bi awayekî tundtir sînordar bikin. Aborînas, bi adetî, encaman nemaze di çarçoveya kamiraniyê de dinirxînin. Ev nayê wê wateyê ku aborînas bawer dikin ku tenê kamiranî xwedî girîngiyeke exlaqî ye. Ew li ser kamiraniyê hûr dibin, lewra bawer dikin ku aborînasi bo ravekirina pirsên kamiraniyê کمک amûrên tekûz peyda dike û lewra hêvî dikin ku pirsên li ser kamiraniyê dikarin ji pirsên li ser wekhevî, azadî, an edaletê werin cudakirin. Wekî ku li jêr hatiye xêzkirin, di derbarê rehendên ên nirxandina exlaqî de hin gotinên aborînasan hene, lê belê kamiranî di navendê cih digire. Bi rastî jî, aborînasiya normatîv, bi awayekî standard wekî “aboriya kamiraniyê” tê binavkirin.

6.1 Kamiranî

Yek ji pirsên navendî ya felsefeya exlaqî ew bûye ku, diyar bike ka kîjan tişt di esasê xwe bo bûnewerên mirovan baş in. Ev, pirseke navendî ye, lewra hemû nêrînên exlaqî yên maqûl cihekî girîng didin kamiranî an xweşhaliya takekesî. Ev, bo havilparêziyê (ku doz dike ku tiştê rast kamiraniya giştî an ya navînî zêdetirîn dike) bi awayekî aşkere rast e. Lê belê nêrînên nehavilparêz jî bi kamiraniyê re eleqedar in; heke ew fezîleta xêrxwaziyê qebûl bikin an bi berjewendiyên takekesan re an jî bi jêdûrbûna zirara li hember takekesan re eleqedar bin.

Gelek rê hene ku mirov li ser xweşhaliyê bifikire, û nêrîna serdest a di navbera aborînasan de jî zewqparêziyê (ku başiyê wekî rewşeke zêhnî, wekî zewqê an bextewariyê, qebûl dike) veguheriye ser wê nêrînê ku dibêje divê kamiranî bi tetmîna tercîhan were pîvandin. Hejmareke aborînasên navdar niha doza vegera zewqparêziyê dikin, lê ew wekî kêmnê dimînin (bnr. Bavetta *et al* 2014, Clark Flèche 2018, Dolan and Kahneman 2014, Frey 2010, 2018, Frey and Stutzer 2001, Kahneman 1999, 2000a, 2000b, Kahneman and Krueger 2006, Kahneman and Sugden 2005,

Kahneman and Thaler 2006, Layard 2006, Ormerod 2008, Radcliff 2013, Weimann and Knabe 2015, û bo rexneyan Davies 2015, Etzioni 2018, and Hausman 2010). Berevajiya zewqparêziyê, qebûlkirina kamiraniyê wekî tetmîna tercîhan, li cihê xwenezirkirina bo yek ji nêrînên derbarê başiya kesekî, rêyên tesbîtkirina tiştên ku bo kesekî baş in diyar dike. Bala xwe bidinê ku wekhevkirina kamiraniyê bi tetmîna tercîhên ve, *ne* wekhevkirina kamiraniyê bi yek ji *hestên* tetmînê ye. Heke kamiranî dikare bi tetmîna tercîhan were pîvandî, naxwe heke tercîha kesekî pêk were dê ew hêj baştir bibe, bêtir ku ka ew pêkhatin wî/wê tetmînbûyî dide *hîskirin* an na.

Çiku aborînasiya sereke bo hemû ajanan rêzkirineke hevgirtî ya tercîhan têtir dike, û çiku modelên taybetir bi adetî ajanan wekî baş agahdarkirî û berjewendîparêz qebûl dikin, bo aborînasan hêsan e ku vê nêrînê qebûl bikin: ajaneke *A* heke û tenê heke di rastiye de *X* bo *A* ji *Y* baştir e dê *X* tercîha *Y* bike. Ev, yek ji cihên ku teoriya pozîtîv vediguheze teoriya normatîv e. Bi ser de, pênasekirina kamiraniyê bi tetmîna tercîhan, bo aborînasan dîlêş e, lewra ew hêj di destpêkê de rê li ber pirsên der barê peyitandina paternalîzmê (ku piraniya aborînasan bi tundî li dij derdikevin) digire.

Kamiranî û tetmîna tercîhan, çiku tetmîna tercîhan kamiraniyê pêk tîne an çiku mirov berjewendîparêz in û dadwerên baş ên berjewendiyên xwe ne, û ji ber vê jî tiştê ku bo wan baş e tercîh dikin, dikarin werin ser hev. Li hember nêrîna ku doz dike ku tetmîna tercîhan kamiraniyê pêk tîne gelek bervêdan hene. Tercîh, dikarin li ser baweriyên xelet werin avakirin. Mirov dikarin xweşhaliya xwe fedayê hin armancên ku zêdetir qîmetê didinê bikin. Tercîh, dikarin manipûlasyoneke kevin an jî bandorên derûnnasiyî yên şewişker nîşan bidin (Elster 1983). Bi ser de, heke tetmîna tercîhan kamiraniyê pêk tîne, naxwe siyasetmedar dikarin mirovan, li cihê ku şert û mercan baştir bikin, bi teşekirina daxwazên wan baştir bikin. Wekî din, xuya ye ku dê bementiqî be ku siyaseta civakî tevî tercîhên berbiçav bibe. Li cihê bersivandina van bervêdanan û hewldana parastina nêrîna ku doz dike ku tetmîna tercîhan xweşhaliyê pêk tîne, aborînas, dikarin van bervêdanan di bin ferzkirineke wiha de red jî bikin: di rewşên ku mirov li dûv berjewendiyên xwe diçin û bo berjewendiyên xwe dadwerên baş in, tercîh tenê dikarin bo tiştên ku kamiraniyê

zêdetir dîkin bibin delîlek (Hausman and McPherson 2009, Hausman 2012). Hin îstîsna hene, nemaze Amartya Sen (1987a, b, c, 1992), lê belê piraniya aborînasan kamiraniyê wekî ku bi tetmîna tercîhan ve tê ser hev qebûl dîkin.

6.2 Biriştî

Çiku pênasêya kamiraniyê bi tetmîna tercîhan, pêkaniya berawirdkirinên kamiraniyê di navbera kesan de nîqaşbar dike, çend aborînas, nêrîneke havîlparêz a siyasetê diparêzin, ku kamiraniya tevahî an navînî zêdetirîn dike. (Harsanyi îstîsnayek e, bo yekî din bnr. Ng 1983). Aborînasan, li şûna vê, bêtir ku berawirdkirinên navkesî bikin, ihtimala nîrxandinên kamiranî yê pêvajoyê, sazî, encam û siyasetên aboriyê lêkolîn kirine. Bifikirin ku du encamên aboriyê S û R hene, û ferz bikin ku hin kes S tercîha R dîkin û ti kes R tercîha S nakin. Di vê rewşê de S li hember R “Pareto payebilind” e, an jî S li hember R “Pareto çêtirbar” e. Bêtir ku ti berawirdkirinên navkesî neyên çêkirin, mirov dikare bigihîje wê encamê ku tercîhên mirovan di S de li gorî R baştir hatine tetmînkirin. Heke li hember S ti rewşên Pareto payebilind tune bin, naxwe aborînas dibêjin ku S “Pareto optîmal” an “Pareto birişt” e. Biriştî, li vir, ne di derbarê kêmtirînkirina hejmara ketanên ku bo hilberana hebek deran an jî hin nosyonên din ên teknîkî divên de, lê di derbarê tetmînkirina tercîhan de ye (Le Grand 1991). Heke rewşek ne Pareto birişt be, wê demê civak, firsenda baştir tetmînkirina tercîhên hin kesan bi awayekî bêmalîyet winda dike. Rewşeke Pareto birişt, jî vê têkçûnê dûr disekine, lê belê tu fezîletên wê yê din ên berbiçav tune ne. Wekî mînak, ferz bikin ku tu kes tîr nabe û xema mirovan tenê mîqdara xwarina ku bi dest dixin e. Qebûl bikin ku du belavkirinên xwarinê hene. Di ya yekem de, bi mîlyonan mirov birçî dimînin, lê ti xwarin li tunê naçe. Di ya duyem de, tu mirov birçî namînin, lê hin xwarin li tunê diçe. Belavkirina yekem Pareto birişt e, lê ya duyem ne. Belkî nosyonên Pareto çêtirbar û Pareto birişt bêtir bîr xuyakirin, çiku hem hema di hemû siyasetên aboriyê de hem mirovên serketî û hem jî yê binketî hene. Dîsa jî, aborînasên sereke, ev têgehên bi du awayan kêrhatî dîtine. A yekem, wan, di derbarê taybetiyên hevserengîya hevrikîdar a tekûz de du teorema îsbat kirine (Arrow 1968). Teorema yekem dibêje ku hevserengiyên di bazarên bi hevrikîdariya tekûz de Pareto optîmal in, û a duyem dibêje ku her jî yek terxanên Pareto optîmal,

tevî awayê belavkirina dahatê ku siyasetmedaran tercîh kirine, dikare hevsengiyê bazarê a bi awayekî tekûz hevrikîdar pêk bîne, di bin wê mercê de ku bi belavkirina rast a kelûpelan a navbera ajanên aboriyî de were destpêkirin. Tê hizirîn ku teorema yekem hîmê nêrîna Adam Smith a destê nedîtbar avêtiye (Arrow and Hahn 1971, Pêşgotin; Hahn 1973). Ev şirove, arîşedar e, lewra heta niha tu aborî negihîştine hevsengiya hevrikîdar a tekûz, û dê negihîjin jî. Teorema duyem, bo dabeşkirina normatîv a kedê ku ji hêla aborînasan ve tê tercîhkirin hinek peyitandinan peyda dike; li cihê ku aborînas bi biriştiyê ve mijûl dibin, yê din bi edaletê re mijûl dibin. Fikir ew e ku teorema duyem dide ber çavan ku teoriyên belavkirina adil bi pêbawerîya bazarên hevrikîdar re li hev tê. Her du teoriyên bingeîn ên aboriya kamiraniyê hewl didin da rave bikin ka çima aborînasên sereke, çi piştgiriya bidin polîtîkayên *laissez-faire* (bazara serbest) û çi jî piştgiriya bidin destwerdanên hikumetê ku başkirina kêmasiyên bazaran armanc dikin, hevsengiya hevrikîdar a tekûz wekî îdealan dibînin. Lê belê girîngiya teoreman nîqaşbar e, lewra bazarên rastîn ji bazarên hevrikîdar ên tekûz pir cuda dibin û, dema ku kêmasiyên bazarê pirjimar bin, “teoriya çetirîna duyem” nîşan dide ku sererastkirina hin kêmasiyan dibe ku civakê, li cihê ku ber ve bibe, ji hevsengiyê hevrikîdar a tekûz dûr bixe (û biriştî û kamiraniyê kêmtir bike) (Lipsey and Lancaster 1956–7).

Rêya din ku aborînasên bo şamiltirkirina nosyonên Pareto yê li ser biriştiyê dîtine, rê li ber dahûrandina lêçûn û qezencê vedike, ku ji bo dahûrandina siyasetê amûreke pratîk e (Mishan 1971; Sugden and Williams 1978 ; Adler and Posner 2000, 2006; Broadman *et al.* 2010; Boadway 2016). Ferz bikin ku S li hember R ne Pareto çetirbar e. Hin endamên civakê dê di guherîneke ji R ber bi S de binketî bûna. Ew kesên binketî, R tercîha S dikin, lê belê têra xwe kesên serketî – yê S tercîha R dikin – hene, ku bi vî awayî, serketî *dikarin* binketiyan telafî bikin û di der barê tercîhkirina S' (tevî qerebûya ku hatiye dayîn, S) li hember R li hev bikin. S , li hember R “çetirbara muhtemel a Pareto” ye. Bi gotineke din, mîqdara diravên ku kesên serketî amade ne ku bo pêkanîna guherînekê bidin, ji mîqdara diravên ku divê wekî qerebû were dayîn da ku kesên binketî li hember wê guherînê dernekevin zêdetir e. (Aborînas, guman dikin ka mirov bi pirsirina ji takekesan ka dixwazin çi qas dirav bidin dikare çi hîn bibe, û li cihê vê ew hewl didin ku ji diyardeyên

bazaran bi awayekî nerasterast derbixin ka çi qas takekes dil dikin ku diravan bidin.) Dema ku S li hember R çêtirbara muhtemel a Pareto be, tê gotin ku “qezenceke net” a siyaseta pêkanîna S heye. Li gorî dahûrandina lêçûn û qezencê, dema her tiştên din wekxwe bin, divê mirov, ji nav siyasetên minasib de (yên ku zêfanên hiqûqî û exlaqî tetmîn dikin) yê ku qezenca net herî zêde ye bi kar bîne. Bala xwe bidinê ku qerebû bi temamî hîpotetîk e. Çêtirbarên muhtemel ên Pareto, serketî û binketiyên derdixe holê, ku ti têkiliya adilbûn an neadilbûna wan bi dahûrandina lêçûn û qezencê ve tune. Pêdiviya edalet an dilsoziyê bi hewldanên civakê bo kêmtirkirina nehevsengiyên belavkirinê heye. Çi ku “pastayeke” mezintir a mal û xizmetên heye da tercîhan tetmîn bike (çi ku qerebû dikare were dayîn û tercîhên her kesî bêtir bîn tetmînkirin), hîlbijartina siyasetên bi qezenca net a zêdetirîn, xizmeta birîştîya aboriyî dike (Hicks 1939, Kaldor 1939).

Tevî girîngiya kirdarî ya dahûrandina lêçûn û qezencê, teknîk û peyitandina ku di paragrafa beriya vê de hatiye xêzkirin arîşedar e. Zehmeteke teknîk ew e ku, gengaz e ku S li hember R bibe çêtirbareke muhtemel a Pareto û R jî li hember S bibe çêtirbareke muhtemel a Pareto (Scitovsky 1941, Samuelson 1950). Ew tê wê wateyê ku rastiya ku S li hember R çêtirbareke muhtemel a Pareto ye, nayê wê wateyê ku di S de li gorî R “pastayeke” mezintir ya aboriyî heye, çi ku, bêguman, nepêkan e di S de li gorî R pastayeke mezintir ya aboriyî hebe û di R de li gorî S pastayeke mezintir ya aboriyî hebe. Arîşeyeke duyem ew e ku dilxwaziya diravdayîna bo hin siyasetan û heke yek li hember wê siyasetê derkeve mîqdara diravan ku bo qerebûyê divê, bi serweta kesekî û her wekî helwesta wî ya li hember wê siyasetê ve girêdayî ye. Dahûrandina lêçûn û qezencê, li gorî tercîhên xizanan, giraniyeke zêdetir li tercîhên dewlemendan bar dike (Baker 1975). Pêkan e ku bandorên dahatê û serwetê bi awayekî gelemper werin telafîkirin (Harburger 1978, Fankhauser *et al.* 1997), lê ew bi zehmet e, û dahûrandina lêçûn û qezencê, bi gelemperî bêyî eyarkirinên bo serwet û dahatê tê bikaranîn.

Bo aborînasiya kamiraniyê ya kevneşop zehmetiyeke din a girantir, ku mîna ku li ber çavan veşartî be, ew rastiye ku hîlbijartin nîşaneyên bikêmasî yê tercîhan e, û tercîh jî bo tiştên ku xweşhaliyê baştir dikin nîşaneyên bikêmasî ne. Heman

rastiyên ku nîşan didin ku tetmîna tercîhan xweşhaliyê pêk nîne (baweriyên xelet, kêmasiya agahiyê, tercîhên din ên beralîkirî û neaqilî), nîşan dide ku hilbijartin û tercîh carinan nîşaneyên xweşhaliyê yên xelet in. Wekî din, dema ku mirov qebûl dike ku tercîh, tenê heke ajan derbarê tiştên ku bo wan dê havildar bibin dadwerên baş bin, nîşaneyên baş ên kamiraniyê ne, mirov xwe bi wê girê dide ku ajan derbarê tiştên ku bo wan dê havildar bibin her tim ne dadwerên baş in, heta dema ku xwediyê hemû agahiya hewce bin jî. Dibe ku di hin deqbandan de, ev arîşe biçûk bin. Wekî mînak, tercîhên mirovan ên di navbera otomobîlên nû de bi piranî berjewendîhez in, baş hatine fikirîn û agahiyên baş vedihewînin. Di hin deqbandên din de, wekî parastina hawirdorê, tercîhên bo paşguhkirina arîşeyan bi piranî agahiyên kêma vedihewînin, li aliyê din, tercîhên polîtîkayên çalakiyê bo çareserkirina arîşeyên hawirdorê, ne pêkan e ku bo kamiraniyê bibin rêbereke baş.

Bo aborînasên normatîv, paşguhkirina van arîşeyan, hêsanîyeke mezin peyda kiriye. Heke hilbijartinên mirovan tercîhên wan derdixîne holê, ku ev yek nîşan dide ka ji bo wan çi baş e, wê demê, wekî ku berê hatiye vegotin, çalakiya hikumetê bo beralîkirina hilbijartinên kesekî, ti carî nikare wî kesî baştir bike, û ji ber vê jî pirsên li ser pejirandina an redkirina siyasetên paternalîstîk nikarin derkevin holê. Lê belê, were şîretkirin an na, paternalîzma serketî ne nepêkan e; û karên dawî yên aborînasên reftarî, ku gelek kêmasiyên sistematîk ên muzakereyê belge kirine, pirsên di derbarê paternalîzmê de dîsa anîne rojevê (Ariely 2009, Kahneman 2011). Hin aborînas, li rêyên tesbîtkirina tercîhên “rast” ên ajankê geriyane (wekî ku ji aliyê Infante *et al.* 2016 ve hatiye şayesandin). Hinekên din doz kirine ku siyasetmedar, dema di rewşa ku ji aliyê darazên xirab an baweriyên xelet ve tîrî şewişandin tercîhan bêhukim dihêlin, divê li hember tercîhên ajanan ên di navbera hedef an armancên wan de rêzdar bin (Thaler and Sunstein 2008, Le Grand and New 2015). Bi ser de, pêşniyaza Thaler û Sunstein ku divê hikumet bo ku mirov hilbijartinên baştir bikin rêbazên ne-zordar (“niquç”) kişf bikin, di nav siyasetmedaran de populer bûye, û mihtemelen nîqaşa felsefî ya li ser paternalîzmê, ji lêhûrbûna Mill (1859) a li ser jêdûrbûna zordariyê wê de biriye (Shiffrin 2000, Hausman and Welch 2010, Le Grand and New 2015).

6.3 Di aborînasiya normatîv de meylên din

Tevî ku aborînasiya kamiraniyê û fikirên li ser biriştîyê, di aborînasiya normatîv de serdest in jî, ew, mijarê naqedînin, û aborînasan, bi hevkarîya felsefevanan, di warê sincnasiyê, û felsefeya civakî û siyasî ya normatîv de bo xebatên hemdem tevkariyên girîng kirine. Beşa 5.2 û Beşa 5.3, derbarê tevkariyên bo teoriya hilbijartina civakî û teoriya listikê hin tuwancan pêşkêş dike. Bi ser de, aborînas û felsefevan, bo ku bikaribin amûrên dahûrandinên aborînasiyê bi kar bînin, li ser arîşeya pênaseyeke fermî ya azadiyê xebitîne (Pattanaik and Xu 1990, Sen 1988, 1990, 1991, Carter 1999, Sugden 2018). Yê din, pênaseyên fermî yê fonksiyonên kamiraniya civakî ava kirine, ku berjewendiyên kesên ku kêmtir baş in didin pêş, an wekheviya çavkaniyan, firsendan û encaman diparêzin, û an jî der barê newekheviyan de berpirsiyariyên takekesî û civakî ji hev cuda dikin (Pazner and Schmeidler 1974, Varian 1974, 1975, Roemer 1986b, 1987, Fleurbaey 1995, 2008, Fleurbaey and Maniquet 2014, Greaves 2015, McCarthy 2015, 2017). John Roemer, bi modelkirina hemdem a aborînasiyê, pênasekirinên tekûz ên kedxwariyê pêşkêş kirine (1982). Amartya Sen û Martha Nussbaum, tenê di derbarê fikirên minasib ên aborînasiya normatîv de di çarçoveya pêkariyan de bi pêşvebirina şiroveyên nû neman (Sen 1992, Nussbaum and Sen 1993, Nussbaum 2000), ku Sen, bi pênasekirina wekhevîparêziyê û bi tevdîrên kirarî yê bêparhiştinê ve girê dide (1999). Di navbera aborînasiya normatîv û felsefeya exlaqî de gelek hevbandoriyên zindî hene. Her wiha ji entriyên li ser azadîparêzî, paternalîzm, wekhevîparêzî û aborînasî [normatîv] û edaleta aboriyê jî binêrin.

7. Encam

Sînorên di navbera aborînasî û felsefeyê de bi metodolojî, aqlîtî, sincnasî û felsefeya civakî û siyasî ya normatîv re eleqedar in, û bi çalakiyan tijî ne. Ev çalakî têvel in û bi pirsên pir cuda re eleqedar in. Tevî ku gelek ji van bi hev ve girêdayî ne, felsefeya aborînasiyê ne tenê teşebuseke yekkirî ye. Ew berhevokeke vepirsînê cuda ye, ku bi saya pêwendiyên di navbera pirsan de, û bandora serdest a model û teknîkên aborînasiya sereke bi hev ve tînin girêdan.

Bibliyografiya li jêr, ne gişgir e. Bo gotarên di berhevokan de bi gelemperî ji serlêdanên cuda dûr disekine. Gotarên li ser metodolojiya aborînasiyê ji hejmarên li ser felsefe û aborînasiyê cihê rêz nake. Hejmareke mezin a gotarên li ser felsefeya aborînasiyê dikarin di kovarên *Economics and Philosophy*, *The Journal of Economic Methodology* de rêzehejmarên salane yê *Research in the History of Economic Thought and Methodology* de werin dîtin.

Dibe ku xwendevan bixwazin serî li *Journal of Economic Methodology*, Vol. 8, No. 1, March 2001 Millennium symposium on “The Past, Present and Future of Economic Methodology” the û Binder *et al.* 2016 jî bixin. Di derbarê metodolojiya aborînasiyê de bo nêrîneke gelemper a ansîklopedîk ji *Handbook of Economic Methodology* a ku edîtorê ji aliyê Davis, Hands, and Mäki ve hatiye kirin binêrin. Bo bibliyografiyeke gişgir a xebatên li ser metodolojiya aborînasiyê yên heta 1988an, ji Redman 1989 binêrin. Gotarên di kovarên aborînasiyê de di *The Journal of Economic Literature* de tînin îndekskirin, û *Index of Economic Articles in Journal and Collective Volumes* jî berhevokan îndeks dike. Xebatên li ser metodolojiyê ên ji 1991an vir ve dikarin di bin hejmara B4 de bên dîtin. Xebatên li ser sincnasî û aborînasiyê dikarin di bin hejmarên A13, D6 û I3 de bên dîtin. Nîqaşên li ser aqlîti û teoriya listîkê dikarin di bin hejmarên A1, C7, D00, D7, D8 û D9 de bên dîtin.

Ackroyd, S. and S. Fleetwood, 2004. *Critical Realist Applications in Organisation and Management Studies*, London: Routledge.

Alchian, A., 1950. "Uncertainty, Evolution and Economic Theory", *Journal of Political Economy*, 57: 211–21.

Alt, J., M. Levi, and E. Ostrom (eds.), 1999. *Competition and Cooperation: Conversations with Nobelists about Economics and Political Science*, New York: Russell Sage Foundation.

Amariglio, J., S. Cullenberg, D. Ruccio (eds.), 2001. *Post-Modernism, Economics and Knowledge*, London: Routledge.

- Angyrous, G., 1967. "Refutation or Comparison?" *British Journal for the Philosophy of Science*, 17: 279–96.
- Ardalan, K., 2016, *Paradigms in Political Economy*, London: Routledge.
- Ariely, D., 2009, *Predictably Irrational: The Hidden Forces That Shape Our Decisions*, New York, Harper.
- Arrow, K., 1968. "Economic Equilibrium", pp. 376–89, *International Encyclopedia of the Social Sciences*, New York: Macmillan.
- , 1974. *The Limits of Organization*, New York: Norton.
- Arrow, K. and F. Hahn, 1971. *General Competitive Analysis*, San Francisco: Holden-Day.
- Aruka, Y., 2015. *Evolutionary Foundations of Economic Science: How Can Scientists Study Evolving Economic Doctrines from the Last Centuries?*, New York: Springer.
- Auerbach, P., 2016, *Socialist Optimism: An Alternative Political Economy for the Twenty-First Century*, New York: Palgrave Macmillan.
- Ayer, A., 1936. *Language, Truth and Logic*, 2nd edition, reprinted New York: Dover, 1946.
- Backhouse, R. (ed.), 1994. *New Perspectives on Economic Methodology*, London: Routledge.
- , 1997. *Truth and Progress in Economic Knowledge*, Cheltenham: Edward Elgar.
- , 2009. "The Rise and fall of Popper and Lakatos in Economics", pp. 25-48 of Mäki, *et al*, (2009).
- , 2010. *The Puzzle of Modern Economics*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Backhouse, R., D. Hausman, and U. Mäki (eds.), 1998. *Economics and Methodology: Crossing Boundaries*, London: Palgrave Macmillan.
- Backhouse, R. and S. Medema, 2009. "The Definition of Economics", *Journal of Economic Perspectives*, 23(1): 221–33.
- Backhouse, R. and P. Fontaine (eds.), 2010. *The Unsocial Social Science? Economics and Neighboring Disciplines since 1945*, Durham, NC: Duke University Press.
- Backhouse, R.E. and B.W. Bateman, 2011. *Capitalist Revolutionary: John Maynard Keynes*, Cambridge and London: Harvard University Press.

- Balzer, W. and B. Hamminga (eds.), 1989. *Philosophy of Economics*, Dordrecht: Kluwer-Nijhoff.
- Bardsley, Nicholas and Robin Cubitt, 2009. *Experimental Economics: Rethinking the Rules*, Princeton, Princeton University Press.
- Barker, D. and E. Kuiper (eds.), 2003. *Toward a Feminist Philosophy of Economics*, London: Routledge.
- Bateman, B., 1990. "Keynes, Induction and Econometrics", *History of Political Economy*, 22: 359–79.
- Baumberger, J., 1977. "No Kuhnian Revolutions in Economics", *Journal of Economic Issues*, 11: 1–20.
- Bavetta, Sebastiano, Pietro Navarra, and Dario Maimone, 2014, *Freedom and the Pursuit of Happiness: An Economic and Political Perspective*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Bear, D. and D. Orr, 1967. "Logic and Expediency in Economic Theorizing", *Journal of Political Economy*, 75: 188–96.
- Becker, G., 1962. "Irrational Behavior and Economic Theory", *Journal of Political Economy*, 70: 1–13.
- , 1976. *The Economic Approach to Human Behavior*, Chicago: University of Chicago Press.
- Beckert, J., 2016, *Imagined Futures: Fictional Expectations and Capitalist Dynamics*, Cambridge, MA: Harvard University Press\.
- Beed, C., 1991. "Philosophy of Science and Contemporary Economics", *Journal of Post Keynesian Economics*, 13: 459–94.
- Begg, D., 1982. *The Rational Expectations Revolution in Macroeconomics: Theories and Evidence*, Baltimore: Johns-Hopkins University Press.
- Bell, D. and I. Kristol (eds.), 1981. *The Crisis in Economic Theory*, New York: Basic Books.
- Ben-Ner, A. and L. Putterman (eds.), 1998. *Economics, Values and Organization*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Berger, L., 1989. "Economics and Hermeneutics", *Economics and Philosophy*, 5: 209–34.
- Bhaskar, R., M. Archer, A. Collier, T. Lawson, and A. Norrie (eds.), 1998. *Critical*

- Realism*, London: Routledge.
- Billings, D., 2016, *Introducing Economic Actualism*, 2nd edition, Bloomington, IN: Author House.
- Binder, C., C. Heilmann, and J. Vromen, 2016. *The Future of the Philosophy of Economics*, London: Routledge.
- Birks, S., 2015, *Rethinking Economics: From Analogies to the Real World*, New York: Springer.
- Birner, J., 1990. *Strategies and Programmes in Capital Theory: A Contribution to the Methodology of Theory Development*, Ph.D. Dissertation, University of Amsterdam.
- Blaug, M., 1975. *The Cambridge Revolution. Success or Failure?*, London: Institute of Economic Affairs.
- , 1976. “Kuhn versus Lakatos or, Paradigms versus Research Programmes in the History of Economics”, in Latsis (ed.) 1976, pp. 149–80.
- , 1980a. *The Methodology of Economics: Or How Economists Explain*, Cambridge: Cambridge University Press; Second Edition 1992.
- , 1980b. *A Methodological Appraisal of Marxian Economics*, Amsterdam: North-Holland.
- Blinder, A., 1974. “The Economics of Brushing Teeth”, *Journal of Political Economy*, 82: 887–91.
- , 1990. “Learning by Asking Those Who are Doing”, *Eastern Economic Journal*, 16: 297–306.
- Boehm, S. et al (eds.), 2002. *Is There Progress in Economics? Knowledge, Truth and the History of Economic Thought*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Boettke, P.J. (ed.), 2010. *Handbook on Contemporary Austrian Economics*, Cheltenham, UK and Northampton, MA: Elgar.
- Boettke, P. and, C. Coyne, eds. 2015, *The Oxford Handbook of Austrian Economics*, New York: Oxford University Press.
- Boland, L., 1979. “A Critique of Friedman’s Critics”, *Journal of Economic Literature*, 17: 503–22.
- , 1982. *The Foundations of Economic Method*, London: George Allen & Unwin.
- , 1989. *The Methodology of Economic Model Building: Methodology after*

- Samuelson*, London: Routledge.
- , 1992. *The Principles of Economics: Some Lies my Teachers Told Me*, London: Routledge.
- , 1997. *Critical Economic Methodology: A Personal Odyssey*, London: Routledge.
- , 2014. *Model Building in Economics: Its Purposes and Limitations*, New York: Cambridge University Press.
- , 2017. *Equilibrium Models in Economics: Purposes and Critical Limitations*, New York: Oxford University Press.
- Bonar, J., 1893. *Philosophy and Political Economy*, reprinted London: Allen & Unwin, 1967.
- Boulding, K., 1970. *Economics as a Science*, New York: McGraw-Hill.
- Boulter, B., 1991. “Pisces Economicus: The Fish as Economic Man”, *Economics and Philosophy*, 7: 83–86.
- Boumans, M., 2015, *Science Outside the Laboratory. Measurement in Field Science and Economics*, Oxford: Oxford University Press.
- Boumans, M. and J.B. Davis, 2015. *Economic Methodology: Understanding Economics as a Science*, 2nd edition, New York: Palgrave Macmillan.
- Boylan, T. and P. O’Gorman, 1995. *Beyond Rhetoric and Realism in Economics: Towards a Reformulation of Economic Methodology*, London: Routledge.
- Boylan, T. and P. O’Gorman (eds.), 2007. *Popper and Economic Methodology: Contemporary Challenges*, London: Routledge.
- Branas–Garza, P. and A. Cabrales (eds.), 2015. *Experimental Economics*, 2 volumes, London: Macmillan.
- Bray, J., 1977. “The Logic of Scientific Method in Economics”, *Journal of Economic Studies*, 4: 1–28.
- Brennan J. and P. Jaworski, 2016. *Markets Without Limits: Moral Virtues and Commercial Interests*, London: Routledge.
- Brennan, T., 1989. “A Methodological Assessment of Multiple Utility Frameworks”, *Economics and Philosophy*, 5: 189–208.
- Bronfenbrenner, M., 1971. “The Structure of Revolutions in Economic Thought”, *History of Political Economy*, 3: 136–51.

- Broome, J., 2012, *Climate Matters: Ethics in a Warming World*, New York: Norton.
- Brousseau, E. and J. Glachant (eds.), 2008. *New Institutional Economics: A Guidebook*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Brown, Andrew and Steve Fleetwood, 2003. *Critical Realism and Marxism*, London: Routledge.
- Bruni, L., 2012, *The Genesis and Ethos of the Market*, New York: Palgrave-Macmillan.
- Brunner, K., 1969. “‘Assumptions’ and the Cognitive Quality of Theories”, *Synthese*, 20: 501–25.
- Brzezinski, J., F. Coniglione, R. Kuipers, and L. Nowak (eds.), 1990. *Idealization I: General Problems* (Poznan Studies in the Philosophy of the Sciences and Humanities, Volumes 16), Amsterdam: Rodopi.
- Buchanan, J., 1958. “Ceteris Paribus: Some Notes on Methodology”, *Southern Economic Journal*, 24: 259–70.
- , 1975. *The Limits of Liberty: Between Anarchy and the Leviathan*, Chicago: University of Chicago Press.
- , 1979. *What Should Economists Do?* Indianapolis: Liberty Press.
- , 2007. *Economics from the Outside In: “Better than Plowing” and Beyond*, College Station: Texas A&M University Press.
- Buchanan, J. and V. Vanberg, 1979. “The Market as a Creative Process”, *Economics and Philosophy*, 7: 167–86.
- Buechner, M.N., 2011. *Objective Economics: How Ayn Rand’s Philosophy Changes Everything about Economics*, Lanham, MD: Rowman and Littlefield.
- Cairnes, J., 1875. *The Character and Logical Method of Political Economy*, 2nd edition, reprinted New York: A. M. Kelley, 1965.
- Caldwell, B., 1982. *Beyond Positivism: Economic Methodology in the Twentieth Century*, London: Allen & Unwin.
- , 1983. “The Neoclassical Maximization Hypothesis: Comment”, *American Economic Review*, 75: 824–7.
- , 1990. “Does Methodology Matter? How Should It Be Practiced?” *Finnish Economic Papers*, 3: 64–71.
- , 1991. “Clarifying Popper”, *Journal of Economic Literature*, 29: 1–33.

- Caldwell, B. (ed.), 1984. *Appraisal and Criticism in Economics*, London: Allen & Unwin.
- (ed.), 1993. *The Philosophy and Methodology of Economics*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Camerer, C., 2003. *Behavioral Game Theory: Experiments in Strategic Interaction*, Princeton: Princeton University Press.
- , 2007. “Neuroeconomics: Using Neuroscience to Make Economic Predictions”, *Economic Journal*, 117: C26–42.
- Camerer, C., G. Loewenstein, and M. Rabin (eds.), 2003. *Advances in Behavioral Economics*, Princeton: Princeton University Press.
- Camerer, C., G. Loewenstein and D. Prelec, 2005. “Neuroeconomics: How Neuroscience Can Inform Economics”, *Journal of Economic Literature*, 43: 9–64.
- Camerer, C., J. Cohen, E. Fehr, P. Glimcher, D. Laibson, G. Loewenstein, and R. Montague, 2008. “Neuroeconomics”, in J. Kagel and A. Roth (eds.), *The Handbook of Experimental Economics*, Princeton: Princeton University Press, 2nd edition.
- Camerer, C. and G. Loewenstein (eds.), 2013. *Advances in Behavioral Economics*, Princeton: Princeton University Press.
- Caplin, A. and A. Schotter (eds.), 2008. *Handbook of Economic Methodology*, New York: Oxford University Press.
- Carpenter, Jeffrey, Glenn Harrison, and John List (eds.), 2005. *Research in Experimental Economics*, Bingley, UK: Emerald Publishing.
- Carter, M. and R. Maddock, 1984. *Rational Expectations: Macroeconomics for the 1980s?* London: Macmillan.
- Chipman, J., 1965. “The Nature and Meaning of Equilibrium in Economic Theory”, in D. Martindale (ed.), *Functionalism in the Social Sciences: The Strength and Limits of Functionalism in Anthropology, Economics, Political Science and Sociology*, Philadelphia: American Academy of Political and Social Science, pp. 35–64.
- Clark, Andrew and Sarah Flèche, 2018. *The Origins of Happiness: The Science of Well-Being over the Life Course*, Princeton: Princeton University Press.
- Clift, E.M. (ed.), 2008. *How Language Is Used to Do Business: Essays on the*

-
- Rhetoric of Economics*, Lewiston, NY and Queenston, Ont.: Edwin Mellen Press.
- Coase, R., 1960. "The Problem of Social Cost", *Journal of Law and Economics*, 3: 1–30.
- Coats, A., 1969. "Is There a 'Structure of Scientific Revolutions' in Economics?" *Kyklos*, 22: 289–94.
- , 1982. "The Methodology of Economics: Some Recent Contributions", *Kyklos*, 35: 310–21.
- Coddington, A., 1972. "Positive Economics", *Canadian Journal of Economics*, 5: 1–15.
- Coddington, A., 1975. "The Rationale of General Equilibrium Theory", *Economic Inquiry*, 13: 539–58.
- Cohen, I., N. Daniels, and N. Eyal (eds.), 2015, *Identified Versus Statistical Lives: An Interdisciplinary Perspective*, New York: Oxford University Press.
- Colander, D. and A. Klammer, 1987. "The Making of An Economist", *Journal of Economic Perspectives*, 1: 95–112.
- Cole, K., J. Cameron, and C. Edwards, 1991. *What Economists Disagree*, 2nd ed. London: Longmans.
- Coleman, J., 1984. "Economics and the Law: A Critical Review of the Foundations of the Economic Approach to Law", *Ethics*, 94: 649–79.
- Collins, H., 1991. "The Meaning of Replication and the Science of Economics", *History of Political Economy*, 23: 123–42.
- Cook, S.J., 2009. *The Intellectual Foundation of Alfred Marshall's Economic Science: A Rounded Globe of Knowledge*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Cooter, R. and P. Rappoport, 1984. "Were the Ordinalists Wrong About Welfare Economics?" *Journal of Economic Literature*, 22: 507–30.
- Coyne, C. and V. Storr (eds.), 2015. *New Thinking in Austrian Political Economy*, Bingley, UK: Emerald Publishing.
- Crespo, R., 2013. *Philosophy of the Economy: An Aristotelian Approach*, New York: Springer.
- Cross, R., 1982. "The Duhem-Quine Thesis, Lakatos and the Appraisal of Theories

- in Macroeconomics”, *Economic Journal*, 92: 320–40.
- Cullenberg, S., J. Amariglio, and F. Ruccio (eds.), 2001. *Postmodernism, Economics, and Knowledge*, London: Routledge.
- Cyert, R., and E. Grunberg, 1963. “Assumption, Prediction and Explanation in Economics”, in Cyert and March 1963, pp. 298–311.
- Cyert, R. and G. Pottinger, 1979. “Towards a Better Micro-economic Theory”, *Philosophy of Science*, 46: 204–22.
- Danner, P., 2002. *The Economic Person*, Lanham, MD: Rowman and Littlefield.
- D’Autume, A. and J. Cartelier (eds.), 1997. *Is Economics Becoming a Hard Science?*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Davies, William, 2015. *The Happiness Industry: How the Government and Big Business Sold us Well-Being*, London: Verso.
- Davis, J., 2003. *The Theory of the Individual in Economics: Identity and Value*, London: Routledge.
- , 2011. *Individuals and Identity in Economics*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Davis, J. (ed.), 2006. *Recent Developments in Economic Methodology*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Davis, J. and M. Boumans, 2010. *Economic Methodology: Understanding Economics as a Science*, London: Palgrave.
- Davis, J. and D. Wade Hands (eds.), 2011. *The Elgar Companion to Recent Economic Methodology*, Cheltenham: Edward Elgar.
- , 2015. *Reflexivity and Economics: George Soros’s theory of reflexivity and the methodology of economic science*, London: Routledge.
- Davis, J., D. Wade Hands, and Uskali Mäki (eds.), 1998. *The Handbook of Economic Methodology*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Davis, J., A. Marciano, and J. Runde (eds.), 2004. *The Elgar Companion to Economic and Philosophy*, Cheltenham: Edward Elgar.
- De Alessi, L., 1971. “Reversals of Assumptions and Implications”, *Journal of Political Economy*, 79: 867–77.
- Deaton, A., 2010. “Instruments, Randomization, and Learning about Development”, *Journal of Economic Literature*, 48: 424–55.

- Debreu, G., 1959. *Theory of Value*, New York: Wiley.
- Dekker, E., 2016, *The Viennese Students of Civilization: The Meaning and Context of Austrian Economics Reconsidered*, New York: Cambridge University Press.
- Delorme, R., 2010. *Deep Complexity and the Social Sciences: Experience, Modelling and Operationality* (New Horizons in Institutional and Evolutionary Economics), Northampton, MA and Cheltenham, UK: Elgar.
- de Marchi, N., 1970. “The Empirical Content and Longevity of Ricardian Economics”, *Economica*, 37: 257–76.
- de Marchi, N. (ed.), 1988. *The Popperian Legacy in Economics*, Cambridge: Cambridge University Press.
- (ed.), 1992. *Post-Popperian Methodology of Economics: Recovering Practice*, Boston: Kluwer.
- De Marchi, D. and M. Blaug (eds.), 1991. *Appraising Modern Economics: Studies in the Methodology of Scientific Research Programs*, Cheltenham: Edward Elgar.
- DeVroey, M., 1990. “The Base Camp Paradox: A Reflection on the Place of Tâtonnement in General Equilibrium Theory”, *Economics and Philosophy*, 6: 235–54.
- Diesing, P., 1982. *Science and Ideology in the Policy Sciences*, New York: Aldine.
- Dietrich, F. and C. List, 2016. “Mentalism versus Behaviourism in Economics: A Philosophy-of-Science Perspective”, *Economics and Philosophy*, 32: 249–82.
- Dietsch, P., 2015, *Catching Capital: The Ethics of Tax Competition*, Oxford: Oxford University Press.
- Dillard, D., 1978. “Revolutions in Economic Theory”, *Southern Economic Journal*, 44: 705–24.
- Dolan, E. (ed.), 1976. *The Foundations of Modern Austrian Economics*, Kansas City: Sheed & Ward.
- Dolan, Paul and Daniel Kahneman, 2014. *Happiness by Design: Change What You Do, Not How You Think*, New York: Avery Press.
- Dopfer, K. and J. Potts, 2008. *The General Theory of Economic Evolution*, New York: Routledge.
- (eds.), 2014, *The New Evolutionary Economics*, 3 volumes, Cheltenham, U.K.: Elgar.

- Dow, S., 1985. *Macroeconomic Thought: A Methodology Approach*, Oxford: Blackwell.
- , 2002. *Economic Methodology: An Inquiry*, Oxford: Oxford University Press.
- , 2012. *Foundations for New Economic Thinking*, London: Palgrave Macmillan.
- Duflo, Esther and Abhijit Banerjee, 2011, *Poor Economics*, New York: Public Affairs.
- Duflo, Esther and Abhijit Banerjee, 2017, *Handbook of Field Experiments*, Amsterdam: North-Holland.
- Dugger, W., 1979. “Methodological Differences between Institutional and Neoclassical Economics”, *Journal of Economic Issues*, 13: 899–909.
- Durlauf, Steven and Lawrence Blume (eds.), 2009, *Behavioural and Experimental Economics*, London: Macmillan.
- Dyke, C., 1981. *Philosophy of Economics*, Englewood Cliffs, NJ: Prentice-Hall.
- Edwards, P., J. Mahoney, and S. Vincent (eds.), 2014, *Studying Organizations Using Critical Realism: A Practical Guide*, Oxford: Oxford University Press.
- Eichner, A., 1983. “Why Economics Is not yet a Science”, in A. Eichner (ed.), *Why Economics Is not yet a Science*, Armonk, NY: M.E. Sharpe, pp. 205–41.
- Elster, J., 1985. *Making Sense of Marx*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Elster, J. and J. Roemer (eds.), 1991. *Interpersonal Comparisons of Well-Being*, Cambridge: Cambridge University Press.
- Engle, R., D. Hendry, and J. Richard, 1983. “Exogeneity”, *Econometrica*, 51: 277–304.
- Engelskirchen, H., 2011. *Capital as a Social Kind: Definitions and Transformations in the Critique of Political Economy*, New York: Routledge.
- Epstein, Brian, 2015, *The Ant Trap: Rebuilding the Foundations of the Social Sciences*, New York: Oxford University Press.
- Etzioni, A., 1988. *The Moral Dimension. Toward a New Economics*, New York: Macmillan.
- , 2018, *Happiness is the Wrong Metric: A Liberal Communitarian Response to Populism*, New York: Springer.
- Fama, E., 1980. “Agency Problems and the Theory of the Firm”, *Journal of Political Economy*, 88: 288–307.

- Ferber, M. and J. Nelson (eds.), 2003. *Feminist Economics Today: Beyond Economic Man*, Chicago: University of Chicago Press.
- Fisher, R., 1986. *The Logic of Economic Discovery: Neoclassical Economics and the Marginal Revolution*, New York: New York University Press.
- Fleetwood, S. (ed.), 1999. *Critical Realism in Economics: Development and Debate*, London: Routledge.
- Foldvary, F. (ed.), 1996. *Beyond Neoclassical Economics: Heterodox Approaches to Economic Theory*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Fox, G., 1997. *Reason and Reality in the Methodologies of Economics*, Cheltenham: Edward Elgar.
- Frank, R., 1988. *Passions within Reason: The Strategic Role of the Emotions*, New York: W. W. Norton.
- Frankfurter, G. and E. McGoun (eds.), 2002. *From Individualism to the Individual: Ideology and Inquiry in Financial Economics*, Aldershot: Ashgate.
- Fraser, L., 1937. *Economic Thought and Language. A Critique of Some Fundamental Concepts*, London: A & C Black.
- Freedman, C.F., 2008. *Chicago Fundamentalism: Ideology and Methodology in Economics*, Hackensack, NJ: World Scientific.
- Frey, B., 1999. *Economics as a Science of Human Behaviour: Towards a New Social Science Paradigm*, 2nd edition, Dordrecht: Kluwer.
- , 2010. *Happiness: A Revolution in Economics*, Cambridge: MA: MIT Press.
- , 2018. *Economics of Happiness*, New York: Springer.
- Fréchette, Guillaume and Andrew Schotter, 2015. *Handbook of Experimental Economic Methodology*, Oxford: Oxford University Press.
- Friedman, M., 1953. “The Methodology of Positive Economics”, *Essays in Positive Economics*, Chicago: University of Chicago Press, pp. 3–43.
- , 1970. “Leon Walras and His Economic System”, in I. Rima (ed.), *Readings in the History of Economic Theory*, New York: Holt, Rinehart & Winston, pp. 145–53.
- Fullbrook, E., 2004. *A Guide to What’s Wrong with Economics*, New York: Anthem Press.
- Fullbrook, E. (ed.), 2001. *Intersubjectivity in Economics: Agents and Structures*,

- London: Routledge.
- (ed.), 2003. *The Crisis in Economics*, London: Routledge.
- (ed.), 2009. *Ontology and Economics: Tony Lawson and His Critics*, New York: Routledge.
